



Danerê Rojnameya pêşî ya
Kurdî Miqdad Mithed Bedirxan

Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 144

Çiriya Paşin
November 1993
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Almanyayê û Fransayê komele û buroyê alîgirêne PKK'ê girtin!



■ Almanyayê 35 komele
û buro, Fransayê jî 2 komeleyên alîgirêne PKK'ê girtin û dest danîn ser mal û mulkên wan.

■ Rêexistin û partiyêne
Kurdistana Bakur ku di qonaxa
avakirina cepheyeyeke
de ne, politika hukûmeta
Almanyayê protesto kirin.

Wezîrê Hundir yê Almanyaya Federal Manfred Kanther di 27'ê Çiriya Paşin de bi bîryarekê çalakiyên alîgir û dilxwazên PKK'ê li eyaleten Almanyayê qedexe kir. Pişti bîryara qedexekirinê, polisê Almanyayê di 11 eyaleten Almanyayê de 35 komele û buroyê alîgirêne PKK'ê girtin û dest danîn ser mal û mulkên wan. Di nav van komele û buroyan de Kurd-Ha, Berxwedan, Kurdistan Komite û FEYKA hene.

Di beyana Wezerata Hundirin ya Almanyaya Federal de li ser qedexekirina çalakiyên PKK, wiha tê gotin. "Almanyaya ne qada ser ya teroristên biyanî ye. Almanyaya dewleteke huquqî ye çi ji aliyê "çep", çi ji aliyê rast û çi siddeten ku ji aliyê biyaniyan ve tên kirin û huzura civatê rehetsiz dîkin, emê musadâ nedîn wan."

Di 30'ê Çiriya Paşin de hukûmeta Fransayê jî li ser şopa Al-

manyayê çû û du komeleyên dilxwazên PKK'ê li Fransayê girtin. Ev Komele YEK-KOM û Kurdistan Komite ne.

Di Komsiyona Wezîrên Adalete û yên Hundirin yên Welatên Ciwata Ewrûpayê de jî li ser kînên PKK'yên li Ewrûpayê hat sekinandin lê li ser qedexekirina xebatên PKK'ê Welatên Ciwata Ewrûpayê negihîştin bîryareke giştî.

Di 24'ê Hezîranê û di 4'ê Çiriya Paşin de alîgirêne PKK'ê li qedexekirina komele û buroyan dilxwaz û alîgirêne PKK'ê yên Almanyayê li Bonnê, Berlinê, Bremenê, Hambürgê, Frankfurtê û gelek bajarêne din tevger li dar xistin, meş çekirin û ev komeleyên wan yên ku hatibûn girtin işgal kirin.

Beri ku Hukûmetâ Almanyayê bi resmî çalakiyên PKK'ê li temamê Almanyayê qedexe bike; polisan li Almanyayê avetibûn ser buro û komeleyên dilxwazên PKK'ê.

Di 18'ê Çiriya Paşin de polisên Fransayê li Parisê, li Lyonê, Marsilyayê, Strasburgê û Rouenê êris biribûn ser komele û malen dilxwazên PKK'ê û 110 kes girtin û ji wan 23 kes avetin hefsê. Di eynî wexte de Polisên istixbarata Swêdê SÄPO avetin ser Kurdistan Centrumê. Û li gor

gerareke SÄPO dê ew li hember dilwaz û alîgirêne PPK'ê qontroleke hîn xurttir bikin.

Reaksiyona li dijî qedexekirina faliyetên PKK'ê

Pişti girtina komele û buroyan dilxwaz û alîgirêne PKK'ê yên Almanyayê li Bonnê, Berlinê, Bremenê, Hambürgê, Frankfurtê û gelek bajarêne din tevger li dar xistin, meş çekirin û ev komeleyên wan yên ku hatibûn girtin işgal kirin.

Rêxisin û partiyêne Kurdistana Bakur; Hevgirtin-PDK, KAWA, KKP, KUK, PîK, PKK, PRK/Rizgarî, PSK, Têkoşîna Sosyalist, TSK û YEKBUN ku di merhala avakirina cepheyekê de ne li ser qedexekirina faliyetên PKK'ê li Almanyayê beyanek derxistin, politika hukûmeta Almanyaya û Fransayê protesto kirin.

Her wisa Civata Kurd li Almanyayê û HEVKAR beyanek muşterek bi zimanê Almani derxistin û qerara qedexekirina faliyetên PKK'ê li Almanyayê rexne kirin.

Qedexekirina faliyetên PKK'ê li Almanyayê di wan çend mehîn dawiyê de herroj di rojeva Almanyayê de bû. Lî van kîrinê dawî yê PKK'ê û seredana serokwezira Tirkîye Tansu Çiller ya Almanyayê vê prosesê leztir kir. Wezîrê

Dûmahîk r. 11

S. Rêving:

Awirekî giştî li ser Kurmanciya nivîskî û "agahiyek" --Rûpel: 5

Yaşar Abdulselamoglu

"Çend gotin li ser Idrîs-î Bidlîsî û drama Kurdan" --Rûpel: 4

Êrîşen li ser Kurdistana federe

■ Di meha Çileya Paşin de gundên Kurdistana Iraqe û Kurdên sivil bûn armanca êrîşen Iran û Tirkiyê.

■ Disa ser di navbera PKK û hêzên Kurdistana Federe de rû da. Li gor agahdariyên der û dora PKK'ê, wan di nav hefteyekê de 11 pêşmerge kuştine.

Êrîşen li ser Kurdistana Federe meha Çileya Paşin de jî berde-wam kir. Iranê rojén 5 û 6'ê Çiriya Paşin bi topê dûravêj û bi roketan li 10 gundên bakur û rojavayê Rewanduzê xist. Ev gundên ku bûne armanca êrîşen dewleta Iranê 40-50 km ji sinorê dewleta Iranê dûr in û li wê herêmê wek ku Iran iddiâa dike tu kampê hêzên Kurdistana Iranê tunene. Xelkên van gundan nuh vegeyiyane ser gundên xwe. Di 11'ê Çiriya Paşin de Iranê gundê Nawtakê bombardûman kir. Ev gund jî 40 km ji sinorê Iranê dûr e.

Li ser van êrîşan Wezîrê Parastinê yê Kurdistana Federe, Cebbar Ferman weha got: "Iranî bi van êrîşen xwe me tehdît dîkin û dixwazin bidin nîşandan ku ew di wê hêzê de ne ku kîngê bixwazin dikarin êris bikin".

Pişti demekê dirêj, êrîşen dewleta Tirkîye jî dest pê kirin. Rojén 29 û 30'ê Çiriya Paşin bala-firin Tirk li 9 ciyên Kurdistana Iraque xistin. Wek her tim, dewleta Tirk ji êrîşen xwe re hebûna PKK'ê wek sedem nîşan da. Lî armanc her qelskirin û bêhuzurkîrina Kurdistana Federe û tevdana dijayediyen navbera Kurdistana Federe û PKK'ê ye. Li gor beyana

PDK-Iraq di êrîşa 29'ê Çiriya Paşin de balafirin Tirkîye li du gundên herêma Barzan ku 40 km. ji sinor ber bi hundir in, xistine. Ev her du gund jî bi alîkariya hêzên navnetewi nuh hatine avakirin, xelk jî nuh vegeyiyane ser gundên xwe. Li gor beyanê, ev ne cara dawîn e ku bi "xeletî" ciyên sivil tê bombardûmankirin. Herweha PDK vê êrîşê protesto dike, bangî Tirkîye dike ku dest ji êrîşen xwe yê vî rengî berde. Di vê êrîşê de 3 gundi hatin kuştin, 6 zarok jî hatin bîfindar kirin. Dewleta Tirkîye jî iddiâa kir ku haya serokatiya Kurdistana Federe ji vê êrîşê heye û di êrîşan de jî tu zerar negîştiye kesen sivil.

Lê nûçeya herî xerab ew e ku dîsa ser di navbera hêzên Kurdistana Federe û gerîlayen PKK'ê de derketiye. Li gor agahdariyên çavkaniyên nêzî PKK'ê bes di navbera 18 û 22'ê Çiriya Paşin de 11 pêşmerge û du hevalbendên PKK'ê hatine kuştin. Li gor beyana Serokatiya Encûmeniya Wezîrîn herêma Kurdistan, PKK di 18.11.1993'an de êris biriye ser baregeheke pêşmergeyan. Di vê êrîşê de 3 pêşmerge mirine, 12 kes jî hatine dîl kirin.

DEP'ê giliya dewleta Tirk li ba KEHE'yê kir

Parlamenteñ DEP'ê muracaatî KEHE (Konseya Hevkârî û Ew-lekariya Ewrûpayê) kirin da ku ew li herêma Kurdistanê komîteyeke çavdîr û daîimî pêk bîne. Di nivîsa ku ji KEHE re hatiye şandin de tê diyarkirin ku "gelê Kurd bûye nuxta armanca jenosidek mezin".

Di vê nivîse de ev dîtin hene: "Rewşa ku li ser şidetê hatiye avakirin di esasê xwe de ji inkarkirina huviyeta Kurdan û redkirina mafên wan yên netewi derketiye holê. Ev yek çiqas dihere hîn ciddî aşîtiya hundurîn, demokrasiyê û mafêni mirovî tehdît dike."

"Her roj di şer de 30 mirov tê kuştin. Bi sedan kuştinê failen wan nedîyar, girtinê tevayî, bîryarîn idaman, kesen "wunda" û işkence bûne perçeyeke jiyan me ya civaki...."

"...Em di pirsa netewi ya Kurdi de çareserkirinê eskerî û siyaseten ku li ser şidetê avabûne red dîkin.... Em daxwaza ku Tirkîye pêdiviyen peymanen navnetewi ku imza wê li bin e, bi cî bîne li we dîkin..."

Ev gilîkirina DEP'ê di rayasiyasyen Tirk de bû sedema reaksiyonen hişk. Hemû Partiyê Tirk nerazîbûna xwe diyar kirin ku çewa DEP dikare giliya dewletê li ba dezgâyên navnetewi bike.

Bi gotin û şela xwe didan diyarkirin ku dema ew me qir jî bikin, mafê me yê gilîkirina wan tune ye. Tercümeya gotina wan a "em birayê hev in, tu cûdabûna me tune ye" ev e.

Rojeva - Mehe

Rêwiyê keştiya li ser pêlan

Çima ku miletwekiliyên DEP'ê li ser mesela îhlalkirina mafêni mirovayî û meşandina terora dewleta Tirk li hemberî Kurdan raporek şandin Konferansa Ewrûpayê ya Hevkârî û Ewlekariyê (AGIK), hukumeta Tirk û hin rojname û televizyonê Tirkîn êrîşek dirindane birin ser wan. Ew xayin û dijminê welêt îlankirin, gotin ku xwedêgiravî wan sonda wekîliya Tirkîye xwarine, wekîlî miletê vî welati ne û diçin di pişt re gîlî û gazinêne me li cem xerîban dîkin, me îxbâri wan dîkin, xencerekî di pişt re li Tirkîye didin.

Ev idîa, durûti û bêperwatîya berpirsiyaren Tirk a tarixî ye. Tim bi vî awayî xwestine çavê me bitirsînin, ne-helin ku em daw û doza miletê xwe di dezgehîn navnetewî de bînîn zîmîn, xebateka piştgirîya navnetewî bikin, di dînyayê de tim bê dost û alîkarî piştgir bimînin.

Di eslê xwe de karê ku miletwekiliyê DEP'ê kiriye, ka-rekî gelek tabîi ye ku Tirkîye bi xwe teahuta qebûl kirina serlîdانا bi vî awayî wek hemwelatî, him maf û him ji wezîfa miletwekiliyê DEP'ê ye. Lî hukumeta Tirk guh nade vê yekê, guh nade teahudê xwe, wan wek xayin îlan dike û kes jî ranabe nabêje "Ey hukumet, ey çapemenî, ev ci durûti, ev ci bêperwatî û bêexlaqî ye".

Lî gava dor tê ser dorê, serokwezîra Tirkîye bi xwe, diçe li cem bîyanîyan îxbâriya miletê xwe, hemwelatîyên xwe dike û medetê ji wan dixwaze. Serokwezîra Tirkîye Tansû Çiller xanimê bi xwe eşkere kir ku gava Amerika zîyaret kirîye ji Bill Clinton re daye diyar kirin ku mudaxeleyi Awrûpayê û Sûriyê neke û alîkarîya van welatan ji PKK'ê nede birrîn, dê hukumeta Tirkîye li hemberî "terorî" bi ser nekeve, û di hilbijartîn sala pêşîya me de wê partîya Tirk ya bi navê "Refah" ê (partîyeke dînî ye) li Tirkîye bi ser keve û li Rojhilata Navîn wê bloka dînî ya İslâmî xurttir bibe. Xwiya ye Bill Clinton efendî, ev îxbâra serokwezîra Tirkîye ciddî qebûl kiriye loma li ser bêqewet-hîstina PKK'ê ligel hukumetîn Ewrûpî û li gel ya Sûriyê muhawelan dike. Heta bi vê gava nuh a Amerikayê siyasetmedarîn Tirkîye iddîa dîkin ku Amerikayê careka din, dev ji karta Kurdi berdaye, mehna wê ew e ku ne bes Kûrdîn Kûrdistana Tirkîye lê yên hemû perçan careka din terkî însafa çar dewletê dagîrker bibin.

De ka îcar em bala xwe bidinê, gelo karê DEP'îyan an ê Tansû Çiller xanimê muxbirî û xencerlîdانا ji pişt ve ye?

Li hember dirûti, sextekarî û fêlbaziyêni wiha, êdî Kurdivê ne şikê ji xwe bikin, ne jî çavtîsandî bibin. Ev herdu tişt jî heta iro tim bûne xeter û tehdiidîn mezin li ser mew-qîfî me yê milî û di siyaseta xwe ya milî de geh em ji bingehê xwe yê esasî şemîtîne, geh jî em hiş bûne, me hustu xwar kiriye.

İro jî em vê yekê dibînin. Li hemberî vê êrişa Tirkîn ne raya giştî ya Kurdan bi awakî hişyar û rêkûpêk xwedî li van wekilan derdikeye, ne jî wekilîn me dikarin istîqrara xwe li ser bingehê maf û berjewendiyêni milî yên giştî bi-parêzin, geh di siyaseta Kurdayetiyyê de dibin ekstremitêni ji realistiye bidürketî, geh hustiyê xwe li ber şûrê Tirkîn xwar dîkin.

Bi vê bêserûberiyê, em Kurdi jî bi kes û xelkîn xwe û bi serok û siyasiyêni xwe bûne wekî rêwiyê keştiya li ber pêlîn deryayê diheje. Keştiya me ji ber pêlîn har ên deryayê hîl dibe. Li vî alî, li wî alî. Di hundîrê keştiyê de bayê deryayê li me daye em hemî gêj bûne, bi vir de wir de dilükumin, tep û rep radibin û dikevin.

Armanc

Rojnama Kurdi ya mehane/Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon: M. Eli, Hesen Mizgin, Mirza Bextiyar, Lewend Fîrat, S. Rêving, M. Lewendî, **Redaktorê berpirsyar:** M. Eli, **Berpirsiyare beşê Dimilki:** Malmisanîj, **Berpirsiyare rûpelîn edebî:** Ehmed Huseynî, **Utgas av:** Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen, **Abonetî/Prenumeration:** Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 200 SKR, Maqam/Myndigheter: 400 SKR, Li Ewrûpa: 50 DM. Li derveyî Ewrûpa: 40 \$, **Anons/ilan:** nîv rûpelîn halvsidan 2500 SKR, **Telefon:** 46-8-803135 **Fax:** 46-8-801825 **Postgiro:** 50 37 99-9, **Adres:** Box: 152 16 161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Konferanseke Navnetewî Zimanê Kurdi Ber Bi Sala 2000'î

Rohat

Di navbera rojê 28/29. 11.1993'an li Universita Sorbonnê konferanseke navnetewî li ser zimanê Kurdi hate pêkanîn. Ev konferans bi "Zimanê Kurdi Ber Bi Sala 2000'î" hatibû bi navkirin. Konferans bi alîkariya Ensîtuya Neteweyî ya Ziman û Medeniyetîn Rohilatê û Enstituya Kurdi li Parîsê hat amade kirin. Ji aliye din konferans wek çalakîke pîrozkrîna avabûna deh saliya Enstituya Kurdi li Parîsê hat pêşkêş kirin. Di konferansê de qasî bîst kesan li ser babe-tên cuda-cuda dîtinê xwe go-

ip Kreyenbroek, Cemal Nebez, İzzettin Mustafa Resul, Amir Hassanpour, Kurdistan Mukriyanî, Ordîxanê Celîl, Kendal Nezan, İbrahim Ahmed, Reşo Zilan.

Giringî û xisûsîyeta vê konferansê ya here mezin bêgu-man cara pêşîn pêkhatina konferanseke navnetewî li ser zimanê Kurdi bû, bi giştîne li ser Kurdan, bi çarçeveke sînorkirî de tenê li ser babeta zimanê Kurdi bû. Ji ber vê hilbijartînê ya rastin ji, pêşî li peydabûna raberzînên nek-êrhatî hatibû birîn, bal û dîhna beşdaran li ser zimîn bû.

Ji aliye din ji bo tespitkiri-na politikake zimîn, konfe-

feransê de gavek hat avêtin, pêwist e gavê mayin vê gava pêşîn teqîb bikin. Mirov di-kare bêje wekî barekî giran li ser milê Kurdan e.

Ji aliye beşdaran de konferansê dikaribû gelek ziman-zan û Kurdnas di nav refen xwe de berev bikira. Ev kemasî di konferansê de geleki eşkere dihate xuyan, wek misal ji Sovyetê, ji Iraqê, ji Almanyê kesen ku di warê zimanê Kurdi de pispor in (ci biyani, ci Kurd) bi berhem û xebatê xwe ve bûne xwedî otorîtekê, tunebûn, bi kemanî gelek kesen ku di warê zimanê Kurdi de bi nav û deng in, wek mîvan, guhdar dikaribûn



Bîstek ji Konferansê

tin û bersivêni pîrsên beşdaran û guhdaran dan. Piraniya kesen ku gotar an ji raporêni xwe pêşkêş kirin ji Fransê dihartin. Her wusan jî çend ziman-zan, Kurdnas û rewşenbîr li welatêni wek Ingiltere, Almanya, Swêd û Rûsyayê hatibûn. Di konferansê de di nav zimanêni cihani de cihê zimanê Kurdi, koka zimanê Kurdi, yekîti û standartkiri-na zimîn, zaravayêni Kurdi û rewşa zimanê Kurdi ya îroyîn wek van babeten çend babeten bingehîn di konferansê de li ser hatin peyivîn. Ew kesen ku dîtinêni xwe di konferansê de pêşkêş kirin, ev bûn: Joyce Blau, Pierre Le-coq, Jean Pradier, Gilbert Lazard, Dara Paratchieva, Mireille Hadas-Lebel, Phil-

ransê bala Kurdan û beşdaran bi xurtî kişande li ser kemasî, tengasi, bêimkanî, dijwarî û serêşîyêni pêsketina zimanê Kurdi, wek tunebûna alfabekî yekrengî, qeliştekîn di navbera zaravayêni Kurdi, kemasîya kadro û sazgehîn zimannasiyê û tunebûna polîtikayêni zimîn ji bo hemû Kurdan...

Armanca konferansê ya bin-gehîn bi xwe ne çarelêkirina pîrsên zimanê Kurdi bû, hem ji aliye wext, hem jî, ji aliye beşdaran konferansê de pey-dakirina îmkanîke wusan radikal tune bû. Lî belê ji bo dan û standinê, pevguhastina dîtin û bawerîyêni cuda, hevnasîna kadroyan, konferansê tenê pêwistî û hewcedari-yeke mezin nişan da. Di kon-

(Foto: Zeynelabidîn Zinar)

beşdar bihûna. Di nav guhdar û mîvanan de, ev kesen jî tune bûn, kesen ku gotarêni xwe dixwendin û kesen beşdar çiqasî "zimanê hev fam dikirin" mirov dikare li ser bifikire. Kesen ku dipeyivîn û guhdar ji du dorberêni cuda hatibûn. Vê yekê ji konferans di nav populîzmê de dihişt û sinorîn zanistî (ulmî) carcar wunda dibûn. Ci dibe, bila bibe ev konferansa ku li Parîsê li ser zimanê Kurdi hate çekirin, gaveke girîng e, gaveke pêşîn e. Her gavê pêşîn bi xwe zehmet in, avêtina van gavan girîng e. Lî belê pêwist e ku her gava tê avêtin mirov dersekê jî bistîne, wê çaxê avêtina gava duwemîn gelekî hêsanter dibe.

Mihrecana Helbesta Kurdi

Di 22.10.1993'an de li Afrînê bi beşdariya helbesta Kurdi bêt amadekirin. Wekî tê 26 helbestvanan mihrecana Helbesta Kurdi zanîn 22. 10 roja wefata şairê me yê bi nav çebû. Komîta Amadekarê Mihrecanê bi da- û deng Cegerxwîn e, ji ber wê yekê ev roj xuyaniyekê da diyarkirin ku ji vê pê de wê hatiye hilbijartin. her sal di 22'ê Çiriya Pêşîn de mihrecana

Hoşeng Kurdaxî-Heleb

Kongreya DEP'ê di 12 Çileya Pêşîn de çêdibe Kongreyeke rengîn tê payîn

Di kongreyê de ji bo serokatiyê Mahmut Kîlinç û Hatîp Dîcle namzetiya xwe danîne. Hejma-ra namzeten dikare zêde bibe.

Kongra DEP'ê ji ber girtina serokê wê Yaşar Kaya pişti du caran texîkîrinê wê di 12'ye Çileya Pêşîn de bicive. Di vê kongrê de rewşa siyasi ya iro di serî de, mu-naqşekirina gelek tiştan tê payîn. Lî xala girfing wê hazirî û tespitkirina stratejiya hilbijartînên 27'ê Adarê be.

Li gor texmînên tê kirin wê ev kongra DEP'ê, li gor kongrîn din yên DEP û HEP'ê bi reng be. Wê ji yekê zêdetir namzeten serokatiyê hebin. Ji nuha ve du ke-san namzetiya xwe danîne; parla-

menterê Semsûrê (Adiyaman) Mahmut Kîlinç û yê Diyarbekirê Hatîp Dîcle. Hejmarâ namzeten dikare zêde bibe. Dibe ku parlamenterê Şîrnexê Mahmut Alinak ji namzetiya xwe deye.

Mahmut Kîlinç li ser namzetiya xwe beyan dan. M. Kîlinç got, heger wek serok bê hilbijartîn wê partiyê bike xwediya bingehêk kîtleyî û dom kir: "Bi ya min dema berê li Tirkîyê HEP, iro ji DEP xelet hatiye danasîn. Li gor M. Kîlinç li Tirkîyê pirsa Kurdî bi hevkariya rêxistinê de-

mokratîk ên kîtleyî wê bê çareserkerin: "Divê DEP li ser pirsên gelek vekirî yê Tirkîyê pêşniyârên xwe konkret bike. Ü vê awayekî vekirî ji rayagîstî re ifade bike. Ji ber siyaseta dewletê ya ku li ser şidetê şekil girtiye dibe asteng ku insanên me li ser wê zemîna bi risk siyasetê bike... Divê li Tirkîyê pirsa Kurd çareser bibe. Divê dewlet di vê mijarê de bi awayekî demokratîk deriyê xwe veke. Divê pirsa Kurd di nav ye-kîtiya Tirkîyê de bê çareserkerin..."

Her du namzet beşdarî kongreyen bajaran dibin, qala program û ditinên xwe yên pêşerojê dikan.

Nameya Kurdistana Federe ji NY û KE'yê re "Êrişen İranê rawestînin"

Serokê Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê Cewher Namiq Salim di 8'ê Çiriya Paşin de li ser êrişen İranê ji Sekreterê Netewen Yekbûyi û Serokê Konseya Ewlekarî ya Navneteweyî re nameyek sand.

Cewher Namiq di namê de weha dibeje:

"Em ji Netewa Yekbûyi û Konseya Ewlekarî ya Navnetewî dixwazin bidin zamin ku gelê Kurdistanê Iraqê ku di şopa siyaseta qirkirin û şewitandina Seddam Huseyîn weke ku di dokumenten navnetewî û bîryaren Konseya Ewlekarî ya Navnetewî de hatine diyarkirin; hate eşandin û dema ew bê durustkirin û ji nû ve avakirina jiyana xwe ya netewî mijûl dibe, ji ali teyare, tanq û

roketên İranê ve tên bombekirin, avahiyên ku hâtibûn avakirin cardin tên hilwesandin, xirakirin û şewitin.

Serokê Birêz,

Em van rastivan pêşkeshi we dikan ku hûn wek rêxistina NY û Konseya Ewlekarî ya Navnetewî berpirsyariya xwe ya çespandina aşti û ewlekarîya navnetewî bi cih binin û bikin ku Iran gîraniya beyana NY û qanûnen navnetewî bizanibe û êrişkariya xwe rawestîne.

Bi hêvi û bawerîya ku em bi riya qanalên heyî ji bo qanikirina xelkê me yê sivil ku nêzi sinorê İranê dijîn û di bin tehdida topen İranê de; bê agahdarkirin.".

BERSIVA NAMA MEHMED UZUNÎ

Berî vê bi du hejmara, nivîsek li ser romana Mehmed Uzun "Tu" di Armancê de derket. Di wê nivîsê de hatibû diyarkirin ku Mehmed Uzunî, hin beşen romana xwe ji kovarê Ronahî û Hawarê wergirtine, lê nedaye nişandan ku ev perce ji hin çavkaniyê din hatine wergirtin û ji xwe çavkani bi xwe ji diyar nekirine.

Li ser vê yekê Armancê xwest cih bide dîtina Mehmed Uzunî ji û ev yek bi nameyekê ragihandê. Di hejmara berî vêya de xwendevanan bersiva wî xwend. Di bersivê de ew qet rastî û nerastiya vê yekê mu-naqşe nake, bi uslûbek ku ne li gorî dev an qelema ronakbirekî ye, ew çêri Armancê û redaksiyonê dike.

Li gorî wî "ziman û uslûba nivîsarê ya su-talîn kuçan" medenîbûna Armancê ne li gorî exlaqê çapemeniyê yê navnetewî" ye. Ew idia dike ku Armanc hesûdi, dijminahî û heqaretî wî dike.

Yênu ku nivîsara Armancê xwendibin, baş dizanîn ku Armancê ne dijminatî û hesûdi-ya Mehmed Uzunî kiriye û ne ji ziman û uslûbek bê edeb bi kar anîye. Di wê nivîsare de tenê metnê ji romana wî li gel met-nê Ronahî û Hawarê bi reqemîn rûpel û hejmar hatîye pêşber kirin û hatiye xuyakirin ku çawa Mehmed Uzunî, ked û xweyda-na xwedî û niviskarê Hawar û Ronahîyê bêyi ku navê wan bide neqlî romana xwe kirine wekî ku malen wî bin ev berhem ji xwe re bi kar anîne. Ji vê pêştir ji Armancê ne tiştek gotîye û ne ji tiştek lê zêde kiriye.

İcar di rewşek wiha de ku pîvan, hesûdi

û uslûba sútalîn kuçan, dijminahî an exla-qê medenî yê navnetewî yê çapemeniyê be, gelo meriv dê yekî ku berhema yekî xesp kiriye û wek malê xwe nişan daye û yekî ku ev xesp diyar kiriye bi ci awayî qim-et bike? Ji alî van pîvanan kî li kîjan alîyi ye, em dispêrin wîjdan û muhakema xwendavan.

Ji alî dinê çîma ku nivîsek wiha di Armancê de çap bûye, ev nayê wê maneyê ku Armanc dijminatîya Mehmed Uzunî dike. Na, Armanc tenê bi vî karê wî, wî qîmet nake, pişti "Tu" yê Mehmed Uzunî hin romanen din ji nivîsine, wek Kurdeki gelek xebat kirine, iro ji di muhaweleylek wiha de ye.

Lê divê ronakbîrén Kurd ji êdî dev ji wê şâşitîyê berdin ku hema qenc an xerab, em ci bikin ji divê em pesnê hevdû bidin, çavên xwe li kil û kîmasî û şâşitîyê xwe bigrin. Gava şâşitîyek me hat derxistin, divê em aciz nebin, dev ji ziman û uslûba medenîbûn û ronakbîrîyê bernedîn, bi zi-manekî feodalî tehditan nebin ser hevû-din.

Ji yekî wekî Mehmed Uzunî dihat xwes-tin ku wê şâşiya xwe ya bêtecrûbetiyê qebûl bike. Do belkî nikaribû têr mesûliyeta karekî wiha bifikire, iro pişti tecrûba haw-qas salan û pişti îspatkirina pêşketina xwe bi riya berhemên xwe, êdî ne muhtacî xwedîlerderketina şâşitîyek wiha bû. Lî mixabin wî ev cesareta medenî hê ji di xwe de nedîye.

ARMANC

NEYNIK

Hilbijartinê 27'ê Adarê

M. Bextiyar

Di 27'ê Adara 1994'an wê li Tirkîyê hilbijartinê herêmî çêbibin. Di vê hilbijartinê de li hemû welayet, qeza û nahîyan serokîn belediyan, li tax û gundan ji wê muxtar bêñ hilbijartin. Meclîsîn belediyan û welayetan ji wê di vê hilbijartinê de nuh bîbin. Hilbijartinê bi vî rengî 5 salan carekê li hemû bajar û gun-dêñ Tirkîyê û Kurdistanê çêbibin.

Lê ev hilbijartin bi gelek aliyan xwe ve hilbijartînek taybetiye. Encamîn wê dikarin di diroka Kurdan de qonaxek nuh vekin û bibin sedemîn rûdanen girfing. Dikarin bibin hêviyeke nuh û xurt, herweha dikare bibe şikestinek ku ji bin rabûna wê xebateke bi salan dixwaze. Ev her du tablo ji ne xeyal in û ji pêkhatinê re ne pir dûr in; Dikare ew xewnê me yên xweş ji bibin rastî, her-weha ew kabûsên ku di xewê de mirov nikare çend deşiqe tehamul bike ji, bibin rastî. Encama hilbijartina 27'ê Adarê wê gelek tişti tayin bike.

Girfingî û taybetiya hilbijartinê 27'ê Adarê ji ku derê tê? Li Kurdistanê digel teror û qetîfamîn dewleta Tirkîyê hisyariya netewî tu demê negîhiştiyê vê kerteyê. Kurdîn welatparêz ci yên bi rêxistin û ci yên bê rêxistin, dema li dor politikayekê hevbeş bi-civin û bixebitîn, dikarin li Kurdistanê prosentek mezîn deng big-rin û vê hilbijartinê qezenc bikin. Li Kurdistanâ Bakur tu demê tevgera netewî bi vê derecê negîhiştiyê kerteya ku bikaribe hilbijartînekê qezenc bike. Di dinya iro de ku kamp û balans nemane, rê û awayê demokratîk hîn bêtir bi tesîr bûne, encama hilbijartinan li ser siyaseta dewletan hîn şopêñ kûr di-hêlin. Di vê rewşê de qezenckirina hilbijartînekê ji serkeftina eskerî ya sed cepheyî mutebertir e.

Tirkîyê ji rewşâ hilbijartina 27'ê Adarê û bi wê re xeteriyen nêzik dibe, baş dibine. Pişti têkçûna Osmanîyan û avakirina Cumhuriyeta Tirkîyê, dewlet tu carî wek vê carê neketiye tîrsa windakirina Kurdistanê. Mirov divê rastiyê gebûl bike. Dewleta Tirkîyê ji me hesastir hereket dike. Ji bo ku di vê hilbijartinê de serbîkeve hezar plan û sanaryoyan amade dike û ji bo riya herî kêm-zir bide ber xwe, mu-naqşe dike. Di vê çerçewê de dewlet texîkirina hilbijartînan, derxistina namzeten muşterek, bi darê zorê û şoresger, dide mu-naqşekirin.

İptalkirina namzetiya kesen welatparêz Bûyera Licê, êrişen li ser bajaran, kuştina Kurdîn welatparêz, li Enquerê civandina serokeşîren alîşîgîn dewletê, dozkirina girtina DEP'ê (Partiya Demokrasyê) neticeyîn siyaseta stratejiya dewletê ya 27'ê Adarê ne. Ji aqila ne pir dûr e ku dewlet nehêle DEP di hilbijartînan de beşdar bibe. Ji xwe ji nuha ve pêla girtin û kuştin û tehdîtkirina berpîrs û endamîn DEP'ê gûr bûye. Dewlet ji bo ku Kurd di vê hilbijartinê de bi ser nekevin, ci ji destâ bê, wê texsîr neke. Li gor şela, bûyera, sanaryoyen dewletê amade ne û şeklîn xwe yên dawî digrin.

Lê em Kurd ci dîkin? Carekê em hîn neketine hewa amadekirina siyaset û pêwistiyen wê yên di derheqa bûyerek hewqas girfing de. Ji bo vê Kurdan diviya bû ji havînê ve bi mu-naqşen niviskî û bi civîn û panelan ve xetên avakirina siyaseteke netewî derxistana û li gor pêdiviyen wê şel bidana xwe. Hemleyeke weha wê heta hilbijartînan wek şeperekê welatparêzan li dor vê siyasetê zêdebikiranâ û heta hilbijartînê bibûna wek lehiyekê ku tu bend li pêsiya xwe nedihêstin. Kongra DEP'ê ji di atmosferike weha de wê pêk bihata. Herweha wê bala raya giştî ya dinyayê ji li ser vê bûyerek bêtir bicivanda. Lê dema mirov li rewşê temaşê dike, raya siyasi ya Kurdan wek ku ne di arîfa bûyerek weha girfing de, hesasiyeteke zêde nişan nade.

Lê iro ji ne hewqas dereng e. Platformeke siyasi ya hêzên Kurdan heye. 12 rêxistinê Kurd di xebata avakirina cepheyekê de ne. İmtîhana pêşî bila hilbijartînê 27'ê Adarê be. Beriya her tiştî divê stratejiye hevbeş ji bo hilbijartînan amade bikin. Her rêxistin li gor vê stratejiyê şelê bide awayê xebata xwe; bi hemû imkan û hêza xwe alîkariya DEP'ê bikin. DEP ji ne bi çavê hilbijartînekê edetû, lê bi çavê referandumekê divê li vê hilbijartînê mîze ke. Dema bi vî rengî lê hat mîzekirin, wê demê DEP divê hemû unsûren neteweyî li dora xwe bicivîne û bi vê perspektifê namzeten derxe. Hêzên Kurd divê lihevhatineke netewî pêk bînin. Ji bo vê ci taviz pêwist be, divê dudîlî nekin. Parastina berjewen-diyan netewî, zêdetir ji yên rêxistinî di rojêne weha de xuya dibe.

RAMANÊN RAMANWERAN

Çend Gotin li Ser Idris-î Bîdlîsî

û Drama Kurdan

Yaşar
Abdulselamoglu

I Nivîsarên Kurdi -ci edebî, ci ilmî, ci dîrok bin li gor standartên unîversal nekemîfîne. Loma, carna dîbin sedemîn reaksiyonêne nebaş, tinazî û hîssîn negatif. Ez, ditina ku Kurd jî divê li gor standartên unîversal karêne entellük-tüeli bikin, tasvîp dikim. Û wek, "em ci bikin heyran, em Kurd in, sewiya me ev e!" mazohîstîyên bedbîni, rewa nabînim. Lê, xwiya ye divê mirov realist be, ji ber ku, pêşketina jîyana entellektûali bûyereke cîvakî, kultûri û kombûna zanînê ye. Loma ya pewîst, ceribandin e... Tiştên şaşî wê hebin. Lê, divê rexnekirina rastgo û dirûst bibe yek ji zagonêne pêşketina berhemên hêja.

Dîrok jî weke hemû rengê zanîtiyê ciddiyetê dixwaze. Ji bo analîzîn zanîstî yê dîrokê pêwîstîya helwesteke dîrokî, metodolojî û hebûna bingehêkî fire ya xebatê çawkanîyê heye. Civata ku dîroka xwe bi realistî şirove dike, faktoreke bingehîn ji bo orîentasyona xwe ber bi reya rast ve peyda kiriye. Em dizanin ku di nav Kurdan de dîrokzanî pêşnekekiye. Zanîna me ya dîrokê bi çirokê malbatêne, xebatê çavkanîyê, tiştên mîtolojik û bi nivîsarên kevnar ve bisînor e. Ji bo bidestxistina encamîn dîrokê yêne rasîn xuya ye pewîstîya kombuneke zanînê heye. Tunebuna vê kombunê bûye sedemîn romanîzîm, nihilistî û peydakirina mîtosên dîrokê.

Yek ji mîtosên dîrokê di nav Kurdan de; "îxaneta" İdrîs-î Bîdlîsî ye.

İdrîs-î Bîdlîsî bûye sembola îxaneta Kurdi. Sedemîn mîtosa "îxanetî"; reaksiyonêne hîssî yê "sendroma xortanî", tunebûna analîzîn rast li ser bûyerên dîrokê û bêîm-kanîya maksîmalizma Kurdi ya ku nikare rewşa jeopolitîk, sosyo-lojik û gelek realiteyê din qebul bike.

Ev çend nîvisarin Riza Polat di rojname "Armanc"ê de ser babetta dîrokê disekine. Berî ku li ser mîtosa îxanetî bisekinim, dixwazîm çend şâşyêne ku di nivîsarên wî de henin nîşan bidim. Di nîvisarek xwe de R. Polat rexne li kesen ku li ser dîrokê dixebeitin dire, xebatê li ser dîrokê weha nabe dibêje.

Em dizanin ku iro, xebatê Kurda bêtür li ser komkirin û peydakirina çavkanîyan in. Bêguman, ev jîbo têgihiştina dîrokê bes nînin, lê, bê van jî dîrok nayê şirovekirin, jîyana rewşenbîrî pêş naakeve.

Xwiya ye R. Polat, wusa bêçavkanî, "Hevalbendiya Şerefhanê Bîdlîsî bi Yavuz Sultan Selim re" şirove dike. Lê, rastî ev e ku, Şerefhanê Bîdlîsî di dema hevalbendiya mîrîfîyen Kurdan bi Yavuz Sultan Selim re hê ji dayîk nebûye. Şerefhanê Bîdlîsî, sala 1543 hatiye dinê, di sala 1579' an de, pişti vegerandina mafê irsi ya mîrîfîya Bîdlîsî ji Qum (qezaya Kerherud ku lê hatiye dinê) tê Bîdlîsî. R. Polat dibêje; "Di

1511' an de Şah Îsmail gazî nêzîkî 25 axa û serokeşîren Kurdan dike (...) Lê Şerefhanê Bîdlîsî û çend axayê din bernade". Emê li jêrê ji bibînin ku ew Mîr Şeref e. Papîre Şerefhanê Bîdlîsî ye. Emîr Şeref kurê Emîr Şemseddîn e. Di sala 1533 de Emîr Şeref navbera xwe bi Şah Tahmasp re baş dike, û li ser vê yekê Şah "naznavê" "Şeref Xan" lê dike û wezifeya mîrîfîyanê Kurdistanê didê. Navê Bavê Şerefhanê Bîdlîsî jî Şemseddîn Xan e. Ew jî kurê Emîr Şeref e. Ango, yê ku bi Yavuz Sultan Selim re hevalbendiye dike û ji aliye Şah Îsmail tê girtin Papîre Şerefhanê Bîdlîsî ye. Em zanîn ku Şerefhanê Bîdlîsî nîvîskarê "Şerefname" yê ye. Ya din divê Riza Polat gotinê "axa", "serokeşîr" û gotinê "Mîr" û "Xan" ji hev cihê bike. Naveroka cîvakî, sîyasi ya wan gotinan ji hev cihê ye.

II

Yê proje û politîkaya hevalbendiya bi Osmanîyan re diparêze û pêk tîne İdrîs-î Bîdlîsî ye. İdrîs-î Bîdlîsî ne mîr, ne axa û ne ji fedalek mezin e. Alimek e. Alim û şexen di dema Emeratiyê Kûrda de tabîî mîrîn Kurda ne, bi pirrani roleki wanî cîvakî-siyasî ya serbixwe bi qasî pişti dema Miran nîne.

Realîteya jeopolitîk ya di navbera İran û Anadoliyê ji bo Kurda rewşek bêşans ava kiriye. Her du coxrafyaya stratejik ji dema kevnar ve di nav reqebeke de bûne. Pers-Yunan, Sason-Bîzans, Moxol-Selçukî, Tîmur-Osmanî, Safevî-Osmanî reqabetêne wan her ifadeya reqabeta herdû coxrafayêne stratejik yên gîring in. Mîrîfîyen Kurdan di vê heremê de loma timî di nav kefteleftê de bûne.. Mîrîfîya Kurd ya Bîdlîsî nimuneyekê baş ya ji bo famkirina vê rastîye ye. "Şerefname" çavkanîyek bin geh ji bo teqîpkirina vê ye.

Di dema Moxol, Selçukî, Tîmur de û her weha di dema Karakoyunîyan de Mîrîtiya Bîdlîsî weke hemû mîrîfîyen Kurdan yêndin di nav bêîstîkrafi û alozîyan de bûn. Ji bo parastina verasetêne xwe di nav çûn û hatinê de bûn. Teví politîkaya diplomasî ya "sa-deqetî" serdestiya Akkoyunîyan ji li ser Mîrîtiya Bîdlîsî 29 salan dom kir. Di wê navberê de gelek serhîldan û keşmekêşî çêbûn. Vê yekê hevgirtina Konfederasyona eşîri ya Rojkîyan xerab dikir. Di navbera xwe de di nav nakokiyan de bûn. Bi taybetî mafê verasetêne di navbera bîra û pismaman de sedema minaqeşeyen daîmî bûn. Di wê demê de di navbera Emîr Şeref û Emîr İbrahîm de (pîsmamîn hev in) şerekî dijwar hebû.

Gava Şah Îsmail-î Safewî ta-hakûma Akkoyunîyan bi dawî anî, serarast li heremê serdest bû, Emîr Şeref, Şah Îsmailê zîyaret kir û ziyafeteke muhteşem rastkir û xelet dan wî. Bi vî awayî emîrnameyek jê derxist ku eyaleta Bîdlîsî di bin idare wî de bîmîne. Cara din, bi Melîk Xelîlê hûkûmdarê Hesenkeyfê, Şah Elî Begê Botî Walîya Cizirê, Mîr Davudê Hîzanî, Elî Begê Sasonî û bi hinek begêne din ji bo ku silav bidin Şah Îsmail çûn ba wî Hoyê.

Li wir, di destpêkê de bûn şayanê eleqetê û giramiya layîq dîtin. Lê, di wê navberê de, Muhammed Xanê Waliyê Dîyarbekirê li begêne Kurda ïtham û iftira kirî û haqaret û ezîyetêne ku lê hatine kîrin ji Şah re gotin. r. 473. Li ser vê yekê, Şah, emîr dide ku beg bêne girtin û emaret bêne istila kîrin.

Şerefhanê Bîdlîsî dibêje ku; "di bin emrê wan de ordiyêne ku hejmaranen wan nedihat zanîn, hebûn" (r.475)

Lê, "pişti demekî ku beg têne girtin, ji aliye Xorasanê, xeber tê ku Ozbek Şeybek (Şeyban) Xan bi armanca îstîflakirina Xorasanê bi ordiyekê mezin ku hed û hesabê wê tûne, ji cema Seyhanê derbas bûye. Ev xeber, Şah Îsmail ditîrsîne; li ser vê Şah, xemginî û poşmanîya xwe dide ðiyarkirin û dibêje ku, dixwaze begêne Kurdistanê serbest bihêle, piştre ji kesen ku hatine serbest kîrin re, "serok û lidera we kî ye?" dipirse. Hemû bi yekdengî û bi eynî gotinan vê bersîvî didin; "Serok û reisîne me yêne xwedî giramî û hûrmetê Emîr Şeref û Melik Xelîl e". Bi vî awayî Şah wana tenê girti dihêle. Şerefhanê Bîdlîsî di "Şerefname" de dinîvîsîne ku, piştre, xwedîyê Emîr Şeref bi ci awayî û bi ci şiklê derweşî wî direvînîn. Emîr Şeref xwe ji kesen Şah Îsmail vedişere. Di wê demê de yêne ku xwe ji wan wedişartin pirr bûn.

Emîr Şeref pişti xilasbûna xwe, bi pêşengîya qomutane xwe Şex Emîr Bilbâsi bi şervanên xwe ku hejmara wan li dor 2000 kesî bû ji bo xilaskirina kelehen Bîdlîsî, Edilcewaz û Erçîse şer dikin, bi ser nakevin.

Şerefhanê Bîdlîsî li ser paşvegirtina Bîdlîsî ji destê Kizilbaşan ji aliye Emîr Şeref, weha dinîvîsîne; "pişti ku hêviya Emîr Şeref ji bo paşvegirtina Wîlîyata Bîtlîsî ku milkê bav û papîren wî ye ji destê kizilbaşan pêk nehat û ev kar pirr dereng ma, ji alîyê din pê haydar bû ku Sultan Selîm Xan niyeta îstîflakirina seranşerê welatê İranê heye; fam kir ku ji bo bikaranîna wan şertan fîrsendeke bêhempa heye".

.Yavuz Sultan Selîm, beravîjîyê Şah Îsmail, politîkaya hevalbendî û dostanî bi begêne Kurda yê sunnî re ajot. Mevlana İdrîs-î Bîdlîsî peyvîkarê aliye Kurda bû. Ji alîyê Kurdan dihat hezkirin.

Di Şerî Çaldiran de (1514) Bêgêne Kurdan bi Osmanîyan re li hember Safewîyan şer kîrin. Ev ji bo pêkanîna politîkaya hevalbendîyê roleki gîring dileyize.

Pişti bînkîtina Safewîyan rewşa begêne Kurdan li heremê xurt dibe. Bajarvanî, kultur, idare siyasi xurt dibe. Li ciyê waliyên İranê, Mîrîfîyen Kurd vedigerin. Şer dom dikir, lê bi insîyâtîfa aktîf ya İdrîs-î Bîdlîsî Kurdan li heremê hakimiyeta xwe pêk anîn. Ji bo ewlekariya vê rewşê di navbera begêne Kurdan û Osmanîyan de ittîfak çêbû. Pêşîlîgirtina İranîya hêza Osmanîyan ji xurt kîrin. Di seferîn Suriye û Misirê Memlûkî ji bin keşbûn. Emanetên muqaddes yên Xelîfîyê biribûn Stenbolê.

Dûmahîk r. 11

Sînîyên me

Zinarê Xamo

Ma Celadet Bedirxan ne hêjâyî muzexaneyekê ye?

Bi munasebeta sedsaliya ji dayîkbûyina Mîr Celadet Alî Bedirxan, di dawiya meha Çirîya Pêşîn de li Stockholmê civîneke bîranîne hate çekirin. Mehmet Uzun li ser jiyan û xebata Celadet Bedirxan, Reşo Zîlan û Dr. Celadet Çelîker ji li ser alfaba wî û hin gelş û kêmasyîn wê, bîrûbaweriye xwe gotin û munaqeşe kîrin. Li gelek deren din ji bi civîn û panelen wiha jidayîkbûyina Celadet Bedirxan tê pirozkirin. Di rojnaman de li ser jiyan, xebat û berhemên vî welatperwer û ronakbirê mezin gelek tişt têne gotin û nivîsin. Her Kurdeki welatperwer dizane ku di tarîxa Kurdan a siyasi û kulturî de rol û xizmeta Celadet geleki mezin e. Ew layiqî her babet hurmet, teqdîr û bîranîne ye. Ev tiştên ku ji bo bîranîna wî têne kîrin giş kîrin û cî de ne û divê bêne kîrin. Lê ji bo bîranîna ronakbirê û welatpererekî wek Celadet Bedirxan, ev babet bîranîn têr nakin, divê tiştên hîn jîndirêj û hîn nemir bêne kîrin.

Wek tê zanîn Celadet Bedirxan ne tenê milletê Kurd wek her milletê medenî kiriye xwedî alfabe, wî her wisa gelê xwe kiriye xwedî gramer û bingeha ferhenga Kurdi jî avetiye. Û ev her sê tişt in ku (alfabe, gramer, ferheng) zimanekî ji wendabûn û ji mirinê xelas dikin û wî zimanî dikin zimanekî jîndar. Bê guman ji bo berdewamiya jîyana neteweyekî bi van ünsûren xwe yêne esası ve hebûna zimanekî gelekî muhîm e.

Celadet Bedirxan, bêyî xebatêne xwe yêne li ser zîmîn, gelek berhemên din û du kovarêne weke zêr; Hawar û Ronahî ji li pey xwe ji gelê xwe re hîstîne. Wek netewe iro em bi van berhemên wî pir serbîlind in, xwedî alfabe û gramer in. Heger wî di warê zîmîn de ev bingeh ji me re danenîbûya nuha em rû bi rûyî gelek gelşen mezin bûn. Nuha, li ser esasê ku wî ji me re daniye pêşdebirin û avakirina hin tiştan gelekî hêsa ye, çimkî em li ser sifreyeke hazır rûniştine. Lê ji tunebûnê avakirina tiştan wiha ne hêsa ye, jê re çap û zanîneke mezin divê.

Cardin em dizanin ku xebata Celadet Bedirxan ne tenê li ser zîmîn û di warê kulturî û edebî de bûye; li gel van xebatêne xwe, wî karê siyasi jî kiriye. Di dema Şerî Cihânî yê Yekem de bi hin welatperweren Kurd ên din re xwestiye Kurdistanê ji bin nîrê Tirkan rizgar bikin, lê bi ser neketine. Di nav tevgera Xoybûnê de cî gitîye, xebat kiriye û hwd. Li ser jiyan û xebatêne ronakbîrekî wiha hêja divê lêkolîn, xebatêne hîn ciddî bêne kîrin; hin tiştên jîndirêj û nemir bêne xuligandin.

Di civînê de Mehmed Uzun diyar kir ku ew li ser jiyan Celadet Bedirxan xebateke edebî de bûye. Bi vê munasebetê jî wî ji jîna Celadet Bedirxan, Rewgen Xanimê li ser Celadet Bedirxan gelek belge, desinivîs û mektûbîn wî, deftera wî ya rojane, protokolên civînên malbatî, romaneke nîvçemayî (Bîra Qederê) û gelek fotograf û tiştên din girtine û nuha li ser wan dixebe.

Ez bawer dikim belgeyêne wiha tarîxi wê li ba gelek kesen din ji hebin. Mesela, Malmisanij û M. Lewendî ji di rojanama Armancê de (hej.142) belgeyeke wiha çap kiribûn. Cardin li ba hin Kurden Sûriyê û kesen ji malbata Bedirxaniyan jî wê gelek tiştên wiha hebin. Him ji bo tarîxa me û him ji bo danîna bingehê tiştekî jîndirêj û nemir wê gelek baştir be ku ev balge hemû li dezgeheke Kurdi bêne arşîvkirin. Ev dezgeh ji iro dikane Enstituya Kurd a Parisê be. Çimkî li welêt iro şerîn parastina arşîveke Kurdi tuneye. Enstituya dikane di vî warî de insîyatîfe bigê û dest bi xebateke wiha bike. Gava hemû tiştên li ser vî ronakbîrekî hêja li derekê bêne komkirin, carê him ji wendabûnê xelas dibin û him ji ji bo kesen ku bixwaze tiştekî li ser wî binivîsîne arşîveke fireh çedîbe. Bêguman divê ev komkirin ji bo armanceke xuya be: Divê bîbe bingehê muzexaneyeke Celadet Bedirxan.

Em dizanin ku Celadet Bedirxan bêyî gelek belgeyêne muhîm li dora neh deh berhemên hêja ji li pey xey hîstîne. Lê ci heyf ku ev giş, hîn bi temamî neketine desten xwendevanê Kurd. Em dev ji gişen wan ji berdin, Hawar hîn bi temamî çap nebûye. Ne Ronahî û ne ji Hawar hîn li welêt çap nebûne û Kurdan ew nexwendine. Ku em dizanin ev her du kovar ji di tarîxa me ya siyasi, edebî û kulturî de cuqasî muhîm in. Di van rojnaman de gelek tişt hene ku divê her Kurd wek hafizquranekî wan ji ber bike. Ya din ji bi van kovaran me dev ji alfaba Erebî berdaye, em derbasî alfaba Latinî bûne. Li ser zîmîn, li ser alfabe di van kovaran de gelek nivîsen ciddî û ilmî hene. Ma ji bo milletekî ev ne kêmasyeke mezin e ku hîn ev belgeyêne tarîxi nebûbin malê millet û li mala her Kurdeki xwenda tunebin?

Awayê bîranîneke nemir a din ji ew e ku partiyek, şexsekî dewlemd, ya jî çapxaneyeke Kurd hemû van berhemên Celadet Bedirxan rojekê berî rojekê li welêt çap bike. Heger çapkirina hemûyan zor be, bi kêmâni divê Hawar û Ronahî bêne çapkirin.

Em Kurd ji tarîxa xwe qut bûne, bûne milletekî bêtarîx. Gava em tarîxa xwe nîzanibin em nîkanin sebebîn bindestiya xwe ya iro jî fêm bikin. Malbata Bedirxaniyan û Celadet Bedirxan beşek ji tarîxa me ya netewî ye. Divê wek netewe em li vê tarîxa xwe xwedî derkevin û biparêzin. Gava em vê nekin, emî tim wek dara bê reh bin, tu carî sax û gulyan nedin.

Awirerekî giştî li ser Kurmanciya nivîskî û "agahiyek"ê

S. Rêving

Dikare bê gotin; dîroka Kurmanciya nivîskî heta cihekî dîroka şkestin û mişextiya Kurdan bixwe ye ji. Eger klasîkîn Kurmancî û kovar û rojnameyên bi Kurdi, Kurdi-Tirkî yên destpêka salen 1900 ï -ji bo vê nivîsederçûne, jê bêñ derxistin, ji 1930 ï û pê ve di dîroka Kurmanciya nivîskî de du qonaxê serekî hene:

1- Qonaxa 1930-1946

2- Qonaxa 1960- 1990

Bi Kurtî û di nav çarçeweyeke giştî de her qonaxek xwedî taybetmendiyêñ cihê ne:

QONAXA 1930-1946

-Kurmancî cara yekem ji aliyê kurmancîzanêñ Kurd bi xwe ve, bi awayekî biserûber û bi armanceke diyar; parastin û pêşxistina Kurmancî, di qonaxa 1930-1946 an de hatiye nivîsin. Sê kovar; HAWAR, RONAHI, ROJA NÜ berhemên serekî yên vê qonaxêne û ji bo qonaxêni pişti xwe mîrata bingehîn ya Kurmanciya nivîskî ne.

-Her sê kovar ji li derveyî welet, li Sûriyê ji aliyê ronakbîrîn Kurd ên mişextî ve hatine derxistin, lê tevî vê ji danûstandinê bêbir yên bi Kurdêñ bakur û yên rojava re bûne sedem ku ku giyanê zimên bêt parastin.

-Kadroyêñ li dor van kovaran, eger cara yekem bi Kurmancî nivîsandibin ji, -nivîsên wan wek pîvan bêñ girtin- xuya dibe ku zimanê wan yê malbatî Kurmancî bûye.

-Kurmancî cara yekem di vê qonaxê de weha bi berfirehî ji qonaxa helbestê derbasî qonaxa pexşanê bûye.

-Wergerêñ ciddî bo ï ji Kurmancî cara yekem di vê qonaxê de dest pê dikin.

-Di dîroka Kurmanciya nivîskî de cara yekem ewqas kadro; helbestvan, çiroknîvîs, zimanzan, siyasetdar, zanayêñ dînî li dor sê kovaran digihin hev.

-Eger hingê li Sûriyê qedexekineke dîrek li ser Kurmancî nebe ji, ev qonax ne teme qonaxa pişti xwe xwedî serbestiyeke temam û imkanenê maddî ye ji.

-Yek ji taybetmendiyêñ heri giring ya vê qonaxê ew e ku di vê qonaxê de bingehê Kurmanciya nivîskî tê qayîm kirin; Kurmanciya nivîskî êdî ne tenê zimanê helbesten zanayêñ dînî, yan ronakbîrîn bijarte ye; jiyana rojane, hesten netewî, danûstandinê civakî, xewn û ken û giriye mîrovê Kurd êdî bi zimanê wî tê derbirîn.

QONAXA 1960-1990

-Tevî ku ev qonax di salen 1960 ï de dest pê dike, lê ku hejmar û berfirehiya nivîsandina bi Kurmancî wek pîvan bêñ girtin, pişti 1980'yi digihe qonaxa

teqînê: ji 1980 yî û bi vir de 26 kovar û rojnameyên xwerû bi Kurdi -ci bigre %90 û wan bi Kurmancî, 30 kovar û rojnameyên bi Kurdi-Tirkî, yan Erebî, Swedî, Elmanî ühw.., 16 weşan-xaneyên Kurdi, 6 weşanên radoyê û bi sedan pirtükên bi Kurmancî ve ev qonax ji aliyê hejmara berhemên bi Kurmancî û cûrbicûriya xwe ve mezintirîn qonaxa Kurmanciya nivîskî ye. (1)

-Vê qonaxê ji wek ya berê li derveyî Kurdistanê, li Ewrûpayê dest pê kir. Û Kurdêñ ku di vê qonaxê de ji dest bi nivîsandina Kurmancî kirin, bi piranî mişexti bûn.

-Di vê qonaxê de serbestiyeke temem ya nivîsandina Kurmancî heye, tîrs û qedexe li welet mane.

-Mixabin mîna qonaxa berê, armanceke diyar ï ji bo gihiştina vê armancê xebatekî biserûber di destpêka vê qonaxê de nayê dîtün. Bi Kurmancî nivîsandin pir zû dijiye qonaxa "modebûn" ê, bi dehan kes cara pêşî û mixabin ji bona ku li dûv modê biçin û hinêk caran ji ji bona ku navûdengiya nivîskariye bi dest xin, yan ji bona ku bidin xuya kirin ku ji filakes, yan bêvankes baştır bi Kurmancî dizanin, dest bi nivîsandina gotar, helbest, çîrok û romana kîrin.

-Piraniya kesen vê qonaxê teme kadroyen qonaxa berî xwe bi Kurmancî nizanîn; zimanê derbirînê ji bo wan bi piranî zimanekî din e; Tirkî, Erebî, Farisi, Elmanî, Swedî û h.w.d., gelek "nivîskarîn" vê demê cara pêşî weha ji nêzîk Kurmancî dibîhîsin, yan dixwînin, hetta hinek ji wan li Ewrûpayê fêri Kurmancî dibin.

-Li hinek welatên Ewrûpayê bi taybeti li Swedê- imkan û alîkariya çapa kovar û rojnameyên bi zimanen biyanî, ji bo hinek kesan dibe sedema destpêkirin, yan berdewamiya bi Kurmancî nivîsandinê.

-Gotinêñ wek "Kurmanciya modêrn", "Kurmancî bi pêş ketiye" cara yekem di vê qonaxê de tîn bi kar anîn.

KURMANCÎ BI PÊŞ KETIYE?

Tevî ku vê qonaxê di dawîya sedsala bîstem de dest pê kîriye ji, ji ber taybetmendiyêñ qonaxê, Kurmanciya nivîskî li gor ya qonaxa berê bi pêş neketiye. Kembûna hesasiyeta li hember zimên, baweriya sist ya ji bo ciddiyeta bi Kurmancî nivîsandinê û bêguman kêmeyîniya Kurmancî, bi zimanekî din fikirîn û derbirîn lê bi Kurmancî nivîsandin (!) weha kîriye ku kovar, rojname û pirtükîn vê qonaxê pîri çewtiyên rîzimanî, yên çapê bin, hevokênu ku ji binî tama Kurmancî nadîn, gelek caran ji tevî ku wek orijinal bi Kurmancî hatîbin nivîsandin ji, gotarênu ku heçko wek wergereke pir xirab bo Kurmancî hatine kirin, xwendevan ji xwendina bi Kurmancî sar kirine. Kovar û rojnameyên vê qonaxê ji aliyê ser-

überiya zimên ve xirabtîrin nimûneyên Kurmanciya nivîski ne.

FIKIRÎN Û DERBIRÎNA BI ZIMANEKÎ DIN

Bê guman ji bona ku pêşketina bi nivîsandinê di Kurmancî de çêbûye bê dîtin, baştîrîn rî berhev-dana her du qonaxan û berhemên Kurmancî yên her du qonaxan e. Kurmanciya iro li gor Kurmanciya kîjan qonaxê bi pêş ketiye, mebest ji pêşketina zimanekî ci ye, ku nivîskarin iro bi "Kurmanciya modêrn" dinîvîsinin, "Kurmanciya klasîk" kîjan e? Bêyî bersîva van pîsan û berhev-dana Kurmanciya berheman mîrov nikare rewşa Kurmanciya iro têbiギhe û bingehêki objektif ji bo gotinê "Kurmancî bi pêş ketiye" yan "Kurmanciya modêrn" bi dest xe.

Mezintirîn seqetiya Kurmanciya nivîskî ya iro û astenga li ber pêşketinê -ji bilî qedexeya dewleten dagîrker- ew e ku zimanê fi-kirin û derbirînê berî Kurmancî zimanekî din e. Kesen ku iro dinîvîsinin berî Kurmancî, fêri zimanekî din bûne. Ev zimanê biyanî ji biçûkatî beta destpêka salen 1980' yî ji ji bo wan zimanê fikirin û derbirînê ye. Zimanê danûstandinê civakî, zimanê xwendinê, zimanê çandî, yê hest û pejnan heta van salen dawîyê ji yan Tirkî, Erebî, Swedî û hwd. bûye. Nivîskareki ku iro bi Kurmancî dinîvîsîne, dikare bo nimûne bi Tirkîye herikî 30 deqîqeyan li ser babetekî bîpeyive, lê nikare li ser eyîn babetî bi Kurmanciye herikî 10 deqîqeyan bîpeyive. Ü ji aliyê naverok û derbirîna babetî ve ji wê peyvîna bi Kurmancî qelstir be. Bê guman di vê yekê de paşvehiştina Kurmancî wek sedemekî dikare bê nîşan dan, lê fikirîna bi zimanekî din û nezanîna Kurmanciyê sedemên mezintir in. Heta iro ji, her çend em di salen 1990 an de dijîn, lê berhemekî Kurmanciya nivîskî tuneye ku ji aliyê serûberiya zimên ve mîrov bikarîye bide ber pêşgotina Nûreddin Zaza ya ku ji bo "Destana Memê Alan" hatiye nivîsandin, yan "Tefsîra Qur'anî" ya Kamûran Bedirxan. Kurmanciya iro ne di mustewa Kurmanciya nivîskî ya qonaxa berê de ye. Du nimûneyen biçûk, lê pir balkêş di vî warî de dikarin gotina me zelaltir bikin:

"Di sevîn çûksayı yê zivista-nan de baranê delal delal xwe ber-dida jér" (TU, rûp. 11, 1984)

"Kundir di serê gel de pelçiqî" (2)

Aliyekî din yê girîng ji ew e ku gelek kesen ku bi Kurmancî dinîvîsinin berî Kurmancî bi Tirkî, Erebî, yan bi zimanekî din tu berhemên edebî nenivîsandine. Eger berhemên wan yêni bi Kurmancî bo zimanekî din bêñ wergandin, yan ji bilî Kurmancî bi zimanekî din binivîsinin, wê ew nivîs wek berhemekî edebî bêñ dîtin, yan ne?

Taybetmendiyekî din ya qonaxa 1960-1990 ew e ku nezanîna Kur-

mancî, erzaniya nivîskariya bi Kurmancî, kembûna qabiliyeta afirandina bi Kurmancî, li Ewrûpa-yê bidestxistina sîfetê nivîskariya Kurdi û bikaranîna imkanen vê yekê, weha kir ku gelek kes li berhemên qonaxa 1930-1946 an vegezin, berhemên nivîskarîn wê demê ji xwe re bikin mal û li ser navê xwe çap bikin. Di vî warî de nimûneya herî tê zanîn romana Mehmet Uzun "TU" ye. Di hejmara 142 ya Armancê de wek yek ji nimûnen rewşa Kurmanciya iro û taybetmendiyen vê qonaxa Kurmanciya nivîskî, nivîsek li ser roman "TU" derket. Li ser nivîse nameyeke İbrahim Guçlu di gel "Agahiyek Biçûk" ya Mehmet Uzun bixwe di hejmara 143 ya Armancê de hat weşandin.

AGAHİYA MEHMET UZUN

Berî her tiştî divê bê gotin ku nivîsa li ser "TU" yê, ya ku di hejmara 142' an de hat weşandin tevî pêşgotina xwe, nivîsa Armancê ye, ne ya kesekî din e û ev yek ji pêşgotina ku ji nivîs re hatiye nivîsandin, xuya ye. Hinek xwendevan dibîjin ku Mehmet Uzun "tîşten folklorî" di romana xwe de bi kar anîne û mafê her nivîskareki heye ku vê yekê bike. Di nivîsa Armancê de xuya ye; "tîşten" li ser tê peyivîn, ne folklorî ne, xwendevan wan, belgeyênu ku ew nivîs tê de hatine nivîsandin, bi nav û bi rûpel diyar in. Gazindeke din ya gişî ji ew e ku "çima pişti 9 salan Armancı rabûye û nivîsek weha li ser "TU" yê çap kîriye". Bê guman diyiabû roja ku bi vê diziye hatiye hesin, li serbihata nivîsandin. Tevî ku di wan salan de bi devkî li ser "TU" yê gelek tişt hatin gotin, lê bi nivîski di çapemeniya Kurdi de tişt hatin gotin. Bi derengî be ji Armancê çap kir. Eger iro çap nebûbaya ji, wê cilênen, pişti 10-20 salan dîsa pê bi-hesiyana û çap bikirana. Ü bê guman bi derengî be ji nivîs li xwendevan xwe yê rastin hatin vegezin. Her weha ji bo rexneyan, yan ji bo eşkerekirina kareki weha demeke destnîşankirî tuneye. Qayideyek tuneye ku rexne, dîtin, divê filan salê, yan bêvan demsalê bêñ çap kirin.

Di agahiyek xwe ya biçûk de Mehmet Uzun gazinda ji ziman û uslûba pêşgotina nivîsa Armancê dike. Lê pêşgotina nivîs nikare bibe sedemê bersivnedanê. Emî ferz bikin nivîs bêyî pêşgotinê çap bûye, ma hingê wê Mehmet Uzun bersiv bidaya? Beşa li jér pêşgotinê nivîsa serekî bû û diyiabû Mehmet Uzun bi bersivdana wê besê, bersiva pêşgotinê ji bidaya. Zimanê pêşgotinê ne yê "sûtalîn kuçan" e û ci dijminahî, hesûdî, çavosoria hevalen Armancê li hember Mehmet Uzun tuneye. Em van gotinan û peyvîn wek "karwan dimeşe..." dispêrin exlaqê Mehmet Uzun û lewra ji pêwîstî bersivdanê nabînîn û dizanîn ku eger ne "bi hezaran tişt" lê, tişt

bi tenê yê Mehmet Uzun li ser me hebuya, şuna wan gotinan, wê ew tişt binivisanda.

Em pir li ber ketin ku Mehmet Uzun bi ken li nivîsarê nêriye û hêjâyî bersivdanê nedîtiye. Divyabû şuna ken, Mehmet Uzun di hundirê xwe de bikeliya. Çunki bi gunheki mezin tê gunehkar kirin. Bersîva medeniyane, bersîva nivîskar û rewşenbiran li hember nivîseke weha ne ken e, lê me dipa ku Mehmet Uzun wê bi kemanî li ser rewşa nivîskariya bi Kurmancî, li ser nivîskariya xwe û tesîra berhemên Kurmancî yên berî xwe, li ser "TU" yê rawestiyâ û wê bigota: "Eger xwendevanen "TU" yê weha têdigîn ku dîzî tê de heye, ez daxwaza lêbûrînê dikim" û dawîya munâqeşeyen li ser vê yekê bianiya.

DIVÊ MEHMET UZUN BERSIVA XWE BIDE

Lê mixabin Mehmet Uzun bi bahaneyen "dijminahî, hegaret, çavosorî, 30 milyon min qebûl dikin, ku 3-4 kes li dij min bin ji ne xem e" yên ku edî "ciddiyeta" xwe winda kirine ji bersivdanê direve. Ev yek ji dibe sedem ne ku gumana li ser "TU" yê, her bîmîne, lê bi şik li berhemên wî yê pişti "TU" yê ji bê nîrîn.

M. Uzun xwe dispêre hejmara rûpelan û xebata xwe ya bîst salan û bi hezaran rûpelan ku wî nivîsandine, dike pîvana nivîskarê. Ev yek rewşa Kurmanciya iro, pîvanen nivîskariya Kurmancî baş xuya dike. Ci ji ber tîrsa parastina Kurmancî ji windabûnê, ci ji ji ber hinek sedemân din be, dîtinekî heta iro ji rî li ber Kurmanciyê girtiye: "Bila bi Kurmancî bê nivîsandin, lê ci be, bila bibe. Heta duh jî rûpelek bi Kurmancî tunebû, iro camîrin rabûne dinîvîsinin, bîhelin hemâ ci be, çawa ji be, Kurmancî ye. Hûn ci ji xelkê dixwazin". Vê nîrînê mora xwe bi giranî li ser berhemên qonaxa heta 1990'î xistiye. Lî bi ya me edî qonaxa tenê ji bo nivîsandinê nivîsandina bi Kurmancî bi davî hatiye û bi hezaran rûpelan ku ji bo vê armancî hatine nivîsandin wê bi tenê ji bo hejmara istatistikân bîn bi kar anîn, ne ji bo pîvana nivîskariye.

Bi gotinêji derveyî naveroka munâqeş, bi bahaneyen cûrbicûr reviyana ji axaftina li ser babetan, bêdengîye li ser rexneyen di de rheqê berhemên xwe de ne karê nivîskar û rewşenbirê rastin e. Em li bendê ne ku wê Mehmet Uzun ne bi derengî, lê yekser bersîva iddiyayen li ser "TU" yê bide û rûpelê bigre.

Lê tevî vê ji em hêvîdar in ku "agahiyek" Mehmet Uzun ya biçûcik wek pîvana mustewa û şexsiyeta nivîskar û rewşenbirê Kurd yên dawîya sedsala bîstem, neyê ditin.

(1) Gotara Reşo Zilan ji bo Konferansa Stockholm 1989

(2) Rojnameya Azadî, sal 1, hej. 32, rûp. 2 İdîomeke Tirkî ye: Kabak başında patlamak (Kundir di seri de teqiyen). 'Mesele di serê wî/wê de teqiyen'.

WALÎYÊ DUHOKÊ EBDULEZÎZ TEYIB:

"Ku her Kurdek mehê buhayê pakêteke cigarê bişîne Kurdistanê, em dikarin gundê xwe ava bikin"

Hevalê me Sidqî Hirûrî bi walîyê Duhokê Ebdulezîz Teyib re li ser problemên Duhokê peyivî. Em vê hevpeyivînê bi munasebeta salvegera yekem ya ûlankirina Kurdistanâ Federe çap dikan. Bi hêviya ku ji rewşa Kurdistanâ Federe tabloyekê bide xwendevanan!

de ne.

Armanç: Kesin hene alî-kariyê distînin û xaniya pê ava dikan, lê naçin tê de û erdê xwe jî naçîn. Jiyana xwe li bajaran bi rê ve dibin. Hûn çawan bersîngê refteke weha digrin?

E. Teyib: Ev problemeke bingehîn e. Me berî çend rojan beyanek derxist û me hemû qaymeqam agahdar kîrin da ku haya wan ji vê pirsê hebe.

Her kesekî xanî jê re hatibe avakirin û nekeve tê de dê hête agahdar kîrin. Eger piştî agahdariyê jî neçû, hingê qaymeqamî destûra hindê heye ku xanî jê bistîne û bide hevwelatiyekî din ku bîkeve tê de.

Di wextê xwe de réexistinê mirovayetiyê gelek gund û xanî bê pilankirin û bê iştîşarekirina rîveberîyê resmî ji hinekan re ava kîrin. Me weke rîveberî dest tê de tunebû û me dizanî ku ew kesî xanî jê re hatîye avakirin na-



Walîyê Duhokê Ebdulezîz Teyib (li aliyê çepê) û Sidqî Hirûrî (foto: Muwaffeq Ruşdi)

keve di wî xanî de û xaniyek xwe li bajêr heye. Nedîviya bû xanî ji kesen weha re hatîban avakirin, kesen muhtactir hene û bê xanî ne, diviyaba ji wan re xanî hatîban avakirin.

Bi dîtina min; eger di serhildana Adara 1991'an de gundê me avakirî bana, me pêwîstî bi hindê nedibû ku ber bi sinorêni Tirkîyê û Iranê biçin. Em da di wan gundan de hêne vehewandin. Bêguman bi alîkariya réexistinê mirovayetî di van du salêndawîyê de nêzî %50 ji gundê neverê hatin avakirin.

Hewildana me bi van réexistin ve ew e ku em bikarîbin bi kîmanî di her gundekî de bingehîkî jiyanê dabimezrîn. Çunkî di gundekî 50 malî de, eger 10 xanî jê bêne avakirin dê binyat bête danîn û hêdî hêdî yê din ji qesta gundê xwe bikin.

Dijminê me mebestek di xerabkirina gundan de hebû, ew jî bidûrxistina xelkê me ji zevî û erdê wan û ji çandinê bû. Armanc ew bû ku civata Kurdistanâ bibe civateke ne berhemdar û hertim pêwîstî bi rejîma Iraqê hebe. Lewma xwecihîn wan gundan di kampan de li neverê bi kîrî çandinê nehatî binecîh dikerin. Her wekû hûn pê agahdar in 4500 gund li seranseri Kurdistanâ Iraqê hatibûn kavil kirin. Ji wan nêzî 600 gundî di parêzgeha Duhokê

Armanç: Rejîma Iraqê elektrîk ji parêzgeha Dihokê qut kîriye û bo hindê rewşa jiyanê di parêzgehê de bi awakî giştî têk daye. Çareserî ci ye û herwesa xwe amadekirina bo zivistanê di warê erzaq û gazê de ci ye?

E. Teyib: Nebûna elektrîk di parêzgehê de problemeke dijwar e. Elektrîka me di destê dijminê me de ye; ji Musilê tê û herwextê rejîma Iraqê bixwaze dê ji me qut bike. Silêmanî û Erbilê bi riya sikrê(baraj) Derbendîxan û Dokanê elektrîka xwe misoger kirine. Li gor lêkolîna ku hatîye kîrin, bo anîna elektrîkê ji Dokan bo Dihokê, dê pêwîstî bi 22 milyon dollarî

me qut bike. Di havînê de dinya gelek germe û pêwîstîya xelqê bi elektrîk heye. Tiştê din yê ku giring ku bi elektrîk ve girêdayîye av e; elektrik nebe av jî nabe. Dijmin jî vê dixwaze, ku problemen me weku hukumet û hevwelatî zêde û dijwar bibin. Parlamento û wezareta navxwe û ya pêşesaziyê mijûlî vê problemê ne. Me giş dostê xwe pê agahdar kîrine. Darbirin jî karekî nebaş e û eger berdewam be dê wextek bêt çiyayêne me bê dar bînîn. Di warê gazê de em li hêviya Réexistina Milleten Yekgirtî (RMY) ne, çunkî di programa wan de ye ku îsal jî gazê ji xelkê me re bînîn. Hewildanê din jî, weku derxistina berê rejûyê (komir), hene.

Jeologên me li ser Silêmanî û Duhokê bi ser hînek cihan hilbûne ku berê rejûyê tê de ye. Niha em mijûlê wê ne, qezencê ji berê rejûyê, bo germkirinê û têrkirina bîsekî ji ihtiyaca xelkê xwe bînîn.

me qut bike. Di havînê de dinya gelek germe û pêwîstîya xelqê bi elektrîk heye. Tiştê din yê ku giring ku bi elektrîk ve girêdayîye av e; elektrik nebe av jî nabe. Dijmin jî vê dixwaze, ku problemen me weku hukumet û hevwelatî zêde û dijwar bibin. Parlamento û wezareta navxwe û ya pêşesaziyê mijûlî vê problemê ne. Me giş dostê xwe pê agahdar kîrine. Darbirin jî karekî nebaş e û eger berdewam be dê wextek bêt çiyayêne me bê dar bînîn. Di warê gazê de em li hêviya Réexistina Milleten Yekgirtî (RMY) ne, çunkî di programa wan de ye ku îsal jî gazê ji xelkê me re bînîn. Hewildanê din jî, weku derxistina berê rejûyê (komir), hene.

Jeologên me li ser Silêmanî û Duhokê bi ser hînek cihan hilbûne ku berê rejûyê tê de ye. Niha em mijûlê wê ne, qezencê ji berê rejûyê, bo germkirinê û têrkirina bîsekî ji ihtiyaca xelkê xwe bînîn.

Armanç: Di wextî de çend kargeh di parêzgehê de hebûn mîna ya pertal (qûmaş), ya konservekirinê û ya mirîşkan, gelo bo bikarxistina wan we ci kîriye?

E. Teyib: Weku hûn dizanin rejîma Iraqê bingeha civata me di her dû warande; pîşesaziyê û çandinê de têk daye.

Ya çandinê, bi avedanki-

rina gundan em çareser dîkin, lê ya pîşesaziyê dijwartir e. Kargehine me hene ji bo ku kar bikin pêwîstî bi hin dezgeh û parçeyan heye. Em, ji ber abloqedana aborî nikarin wan bînîn. Yek ji wan, kargeha mirîşkan e li Duhokê. Eger ew kargeh çêbibe û kar bike dê berhemê wê têra hemû Kurdistanê bike, lê xirabe ye û pêwîstî bi hînek dezgehan heye. Fabriqeya konservekirinê kar dike û ava bacanan, tehînê, doşavê û hînek rengê sosê çêdike. Lê pêwîstiya wê jî bi çêtirîkirinê û sexbîrîyê heye û bo wê çendê jî pêwîstî bi tiştê dîrve heye. Kargeha pertal û mehfûran heye, lê ne gelek modern e. Qonaxeke kîrî tê de çêdibe û qonaxa dawîyê li Erbilê tê bi cî anîn. Eger embargo nebaya me dê kargeheke biserûber ava bikiraya ku herdû qonaxê karî tê de bi cî hatibana.

Pêwîstiya me bi kargehîn hîrana genimî, yê arî heye. Me dendikên gulberojan pir hene û li gor zanyarıya min damezrandina fabriqeyen zeytê, xwarinê karekî hîsan e û pêwîstî bi gelek tiştan nîne, lê abloqedana aborî li ber çêkirina fabriqê û kargehîn wisa û bikarxistina yê kevin girtîye. Me hertim şîrketên bîyanî dawet kirine ku bîn û pareyê xwe li parezgehê û li seranserê Kurdistanâ azad bi kar bixin. Lî problem di wextê mana hevsozan de ye ku şeş meh in. Wextekî weha kurt piştarşîyê li cem

Heppeyivîn

wî xelkî çenake ku bi bisteħî bêt û pareyê xwe li Kurdistanê bi kar bixe. Her ji ber hindî jî hemîše parlamento û hukumeta herêmê dixwazin ku demê mana hevsozan bo parastinê bêt dirêjkirin bo pênc yan du salan.

Armanc: Di parezgehê de, mîna seranserî Kurdistan Başûr ya azad, du hêzên siyasi yêner serekî hene ; PDK û YNK, gelo rolê wan li hember hukumeta Kurdistanê û rîveberîyê wê çawa ye? Negativ e an pozitif e?

E. Teyib: İdare ji çend partîyan û nexasma ji PDK û YNK hatiye pêkanîn. Niha ku ez walî me, ez ne nûnerê PDK'ê bi tenê me. Rast e ez kandîdatê PDK'ê me bo vî cihî, lê ez nûnerîya herdû partîyan dikim. Ez bi navê herdû partîyan idareyê li vir bi rî ve dibim.

Carna karêñ çewt çêdibin, lê bi dîtina min ci armancek cihê ji herdû partîyan tê de nîne. Dibe amirhêzek yan pêşmergeyek bi awayekî din fikir û reftar dike û bibe egera peydakirina problemekê. Lî em hertim pev re rûdîn û wekû idare û partîyan siyasi di parêzgehê de, em cîvînên xwe yêner çedîkin. Tê de wan probleman tînin zimên û munaqşe dikin û çareserîyan jê re peyda di-

kin. Bi nerîna min, eger helwîstê alîyekî nebaş ba, me nedîkarîbû idareya xwe bi vî awayî serkeftî bajon.

Armanc: Min di vî hatîna xwe de li Zaxo zanî ku gelek kes di rîzê de ne bona ku biçin Tirkîyê û ji wê derê derbasî Ewrûpayê bin. Gelo jibo vê derbaskirinê hûn çawan peywendîyê bi Tirkîyê re datînin? Rojê çend vîzeyan didin we? Hûn ji vî derkeftinê re alîkar in yan li hember radiwestin?

E. Teyib: Hewldana me wek hukumet ew e ku em vî revê ji Kurdistanê kêm bikin. Xelkek heye hez dike derbi-keve û her yekî çend sedem ji xwe re destnîsan kirine ku ji ber wan dev ji welatî berdin. Yek dibêje rewşa aborî nebaş e û yekî din dibêje istîqrara siyasi tuneye, hin dibêjin hîn Seddam heye û neku careke din Kurdistanê dagîr bike ve. Heye ji dibêje ku hevrikatîya partîyan e û kuştin heye. Em dibêjin derkeftin û mişextbûnê na, me pêwîsti bi xelkê xwe heye. Divêt xelkê me tehemmulê bike û fidîkar be bo ku em pev re rewşa Kurdistanâ xwe çetir lêbikin.

Em nabêjin rewşa aborî baş e. Lî gelek xerab ji

nîne. Kes li Kurdistanê ji birsa nemirîye. Me axa baş heye, me av heye û cotkarêne me şereza ne. Ez di wê bawerîyê de me em dê di wextekî nêzîk de bi van imkanêne xwe bikarîbin pêwîstîyêni jiyanê yêner serekî bi dest xwe bixin. Mafê mirovî li Kurdistanê tê parastin, azadîya siyasi û damezrandina partîyan heye. Dadgeh serbixwe ne û mudaxele bi kar û barêne wan de gelek û gelek kêm bûne.

Di warê vîzeyan de em digel Tirkîyê pêk hatine ku rojê pênc vîzeyan bidin me. Ev pênc vîze berî her tiştî bo nexweşen ku nexweşîya wan li Kurdistanê çareser nabe û bo wefdîn resmî yêner parlemento û hukumetê û partîyan siyasi têne wergirtin. Halîten din ji hene, wekû mînak kesekî iqame li welatekî jê re derkeve, li vir em wekû hukumet neçar in alîkarîya wî bikin û vîzeyekê jê re bistînin eger me pê çê bibe.

Ew kesê ji dil hez neke li Kurdistanê be, bimîne ji dê tesîreke negatîv hebe. Divêt mirov bi xwe hez bike li welatê xwe bimîne yan vegere welatê xwe. İro rewşa welatê me roj bi roj berbi çetir e û pirsa Kurd cihekî baş digre.

Kurdistan a me ye û em tê de azad in û eger kêmasyen me ji hebin, em hemû pev re dikarin çareser bikin.

mirov bi xwe hez bike li welatê xwe bimîne yan vegere welatê xwe. İro rewşa welatê me roj bi roj berbi çetir e û pirsa Kurd cihekî baş digre.

Kurdistan a me ye û em tê de azad in û eger kêmasyen me ji hebin, em hemû pev re dikarin çareser bikin.

Armanc: Li bajêr qala çekfirotinê tê kirin û hînek cadde ji wekî cihê firotina wan tê dest nîşankirin, li derveyî leşkerê Kurdistanê û nemaze li gundên li ser sinoran û wekû min bi çavên xwe dîti hêzine İslâmî hene, milîsen wan hene û çek didin ser hev. Gelo haya hukumatê ji vê çendê heye û erê hûn hizir nakin ev yek di pêşerojê de ji dewleta federal re bibe xetereke mezin?

A. Teyib: Em hewl didin zahîreya çek kêm bikin. Ü bi rastî ji eger tu ïsal û par-

deynî ber hev dê bibînî ku çek ïsal kêmtrî e, di vê mehede ji meha derbasbûyî kêmtrî e. Biryar bo me ji Wezareta Navxwe hatine û em bi hemû partîyan siyasi re ji rûniştine û gişan amadebûna xwe bo bicihanîna wan bîryaran anîye zimên. Em, niho mijûlî damezrandina leşkerekî yekgirtî yê Kurdistanê ne. Helbet damezrandina leşkerekî yekgirtî hîsan nîne û pêçebûn pêwîst e. Me ji di aniha de hemû tişt pê çê nabe. Em nikarin cîlkî leşkerî ji hemû leşkerê xwe re çê bikin. Eger em bikarîbin leşkerê xwe bi hemû pêwîstî û dezgehîn wî ve çê bikin, dê em bikarîbin vê problema belavbûn û firotina çekî ji nav bibin.

dewam e. Hemû partîyen siyasi ji piştgirîya vê komîsyone û dîkin ku di karê xwe de serkeftî be û bikarîbe kujekan destnîsan bike. Dibe her kuştinek ji ya din cuda be. Em di wê bawerê de ne ku di pişanîya van kiryan de destê dijminî heye û ew di riya zelamin wî de têni bi cih anîn. Mebesta dijminî ew e ku nerehetî û tîrsî li Kurdistanê belav bike û xelkê me bêzar bike. Her weha dixwazin bi vî awayî xelkê biyanî û rîxistinê insanî yêner ku li Kurdistanê kar dikin bitirsîn, bona ku li Kurdistanê nemîn û astenga bixin di riya alîkarîya ku ji me re tê.

Dijmin berdewam e li ser peqandina mayinekî li vir û


bikin. Helbet hukumeta İraqê berdewam destdirêkarîyan dike lê bêtir di nav de. Weku mînak berî çend rojan grûpe ke çekdarêne wan ji Feydiyê bi veşarkî derbas bûn alîyê me û arpîci berdan zalgeheke (seytereyeke) me. Tiştîn weha hene û bingehîn me yêner leşkerî bo bersivdan û bersinggirtinê amade ne. Bi Tirkîyê ve wek hûn hemû dîzanîn me şerîteke dirêj ya sînûr heye. Em wekû Hukumeta Herêma Kurdistanê pûte didin sinoran, ji ber ku em jê berpirsiyâr in û divêt em sinoran xwe biparêzin. Me li ser sinoran bingehîn çavdêri û parastinê yêner leşkerî deyنانe û di riya biroyen Hevsozan de li Zaxo danûstanîn me bi Tirkîyê re berdewam in.

Armanc: Gotina we bo Swêdiyan û bo Kûrdêne li Swêdê û daxwaza we ji wan ci ye?

E. Teyib: Di rastiyê de xelkê derve û nemaze Ewrûpa alîkarîyeke baş pêşkeshî milletê me kirîye. Bi dîtina me bi ci niyet be xelkê derve bête Kurdistanê baş e û em pê xweşhal in. Evca ci bo dîtina vê tecrubeya me ya demokratî be, ci alîkarîya ji xelkê me re bîne ci bi geryan bêt tiştîkî baş e û em bixêrhatina wan dikin. Me pêxweş e bîn, vê tecrubeya me bi çavên xwe bibînîn û raya giştî ya cihanî li ser agahdar bikin. Ji alîyê din ve ji em di vê tecrubeya xwe de nû ne û me pêxweş e istifadeyê ji tecrubeya çendin salan ya xelk û mîleten din bikin. Me pêxweş e dîtin û lênerîn û rexne û têbinîyê xwe li ser tecrubeya me bêxin berçavîn me.

Penaberên me li derve dikarin rolekî mezîn di parastina vê destkefta me ya dîrokî û neteweyî de bilîzin ew ji agahdarkirina raya giştî ya wan welatîn ew tê de dijîn li ser rewşa Kurdistanê û guhertîn tê de çêdibin. Dikarin berî xelkê derve bidin Kurdistanê, dikarin di warê madî de alîkarîye bikin. Weku mînak me li Duhokê zanistsgeheke nû heye û bo me wekû hukumet û rîveberîya parêzgehê û bi imkanêne me heyîn pir zahmet e hemû pêwîstîyê wê peyda bikin. Penaberên me li derve dikarin bi besdarbûneke maddî ya bîçük vê unîversîte pêşde bibin. Dikarin alîkarîya wê bi peydakirin û hinartina pirtûkîn zanistî bikin.

Eger her Kurdeki mehê buhayê paketeke cigara bişîne welatî dê valahîyek pê pir bibe û dê pêwîstîyek pê hête bîcianîn.



Ebdulezîz Teyib: Ku ji destê Iraqê bê, wê oksijenê ji li me bibire. (Foto: Muweffeq Ruşdi)

Niha di qonaxa yekem de em giraniya xwe téxin nav bajêran ku em çekî tê de kêm bikin. Di qonaxa dawiyê de emê li gundan û ser sinûran ji wê bîryarê bi cih bînîn.

Armanc: Li ser kuştina hin kesan li bajêr gelek tê aixtin, hem li vê derê hem ji li dîrve, kesen mîna Reûf, Fransîs, Hakim Tehsin, Ebû Nasir û Rînas. Dîrve we wek hukumet li hemberi van kuştinan ci ye? Gelo lêkolînen we li ser berdewam in yan we pirs girtîye û dev ji lêkolînan berdaye?

E. Teyib: Nexêr, lêkolîn berdewam in, komîsyonek ji çetirîn hakimên parêzgeha me bi pejirandina Wezareta Edlî hatîye çêkirin. Ew komîsyon di vekolînen xwe de ber-

yeke din li dereke din û nemaze peqandina otomobilên biyanîyan.

Niha plana wan ew e ku kesen nîşimanperwer di partîyen siyasi û hukumetê de bikujin. Di hînek destdirêkarîyan de yêner pê rabûyî hatin nasîn û ew girêdayî rejîma Iraqê bûn û revîn çûn Müsilî.

Armanc: Duhokê sinoran digel Tirkîyê û hem ji digel Iraqê heye. gelo leşkerê Iraqê provakasyonan li we û leşkerê we dike û reftara Tirkîyê digel we çawa ye?

E. Teyib: Hevsozan çavdêriya xetê di navbera me û Iraqê û bingehîn wan yêner leşkerî dikin. Di navbera me û leşkerê Iraqê de xetek heye ne me û ne wan mafînî leşkeren xwe tê de bi ci

Çand û wêje

ARTUR RIMBAUD



Demsalek di dojehê de

-III-

Em bi rê nakevin. -De em wan rêçen ku li vir in vegevîn, bi riswabûna xwe barkirî me, riswabûna ku ji ciwaniya min, rêhêne xwe ên êşdar berdane teniştâ min. Ü ya ku hildikse esman, li min dixîne, min ser û bin dike, min bi dû xwe de dikişkişine.

Bêgunehiya dawîn û şerma dawîn. Ev hatiye gotin. Ku ez genitî û nokeriyên xwe bi xwe re nebim nav cihan.

De em herin! Ji bo birêveçûnê, bar, biyaban, bêzarî û torebûnê.

Ez xwe bidim kê bi kirê? Gerek ez kijan lawirî biparêsim? Kijan wêneya pîrozane êrif bikim? Kijan dilan bişikînim? Bi kijan derewê bîpeyivim? Xwe berdim nav kijan xwinê? A çêtir ew e ku xwe ji dadperwîriyê dûr bixînim. -Jiyana req, kawikiya sade- ku bi kulma xwe ya zuha devê tabûtê rahêjim, ku rûnêm û xwe bixeniqînim. Wisa ne pîremêri heye, ne metîrsî heye: teror ne karekî Fransî ye.

Ax! Ez hetanî çi radê jibîrkirî me taku ez, gavên bialî kamilbûnê de diyarı her wêneyek Xwedayî dikim.

Ez çiqasî ji ezîtiyê dûr im, çiqasî dilovaniya min payedar e! Ha li vira. Li vir, bi ser de ji, li ser vi zemînî! Ji dil EY XWEDA! Çendin kawik im!

❖ ❖ ❖

Her ji zaroktî ve, şeydayê wî girtiyê serhiş bûm ê ku herdem dergehîn girtixanê bi ser de têr girtin. Min serdana meyxane û odayêni raxistî ên ku dê wan pirozmend bikira, dikir, min bi dîtina wî, esmanê şîn û karê gulbîskîvî ê gundan, didîtin, min çarenûsa wî li bajaran bîn dikir. Ji pêxemberkî bîhêzir bû, ji gerokekî pir têgîhîştir bû û ew, tenê ew! şahidî serbilindî û rastiya xwe ye.

Li ser rêçan, di şevê zivistanê de, bê mal, bê cil û berg, bê nan, dengekî dilê min ê seqemgirtî dixeniqand: "Lawazî yan hêz e: Ha tu wayî, hêz e. Tu nizanî ber bi kuderê diçî û ne ji ji bo ci, derbasî hemî cîgehan bibe, bersîva xwe pêşkêşî hemî tiştan bike. Kes te nakuje mîna ku çawan kes termekî nakuje". Biyanî, awira min pir zelûl bû, laşê min pir westiyayî bû, renge, ew kesen ku pêrgî wan bûbûn, min nedîbûn.

Li bajaran, ji nişkê ve, herî ji min re sor û reş dixuya, wek neynikê dema ku çira li oda teniştê, bilive an mîna gencîneyekê di daristanê de! Bextekî qenc, min kir hawar, min di esman de deryayek ji xetîre û dûmanê didit; bi alî rastê de, li ser çepê, hemî saman, wek milyarek birûsk, gur dibin.

Lêbelê çewtbazî û dostaniya jinan li min qedexe bûn. Hema hevalek çiye nebû. Min xwe li hember komexelkek torebûyî didit, li hember hêzek sêdarkar, ji ber destê wê hejariya ku nikarin têbîgîhêjin ez digiriyam û lavlavê dikim -wek JAN DARK!-. "Ey oldarno, ey mamosteno, ey girigreno, hûn şasin ku hûn min dispêrin destê dadgehê. Hergiz ez ne ji vi mileti bûm; hergiz ez ne Fileh bûm, ez ji wî nijadî me ê ku di êşê de distira; ez rêzbandan tênagîhem, hesta sinçî li ba min nîne; ez dewar im: hûn çewt in..."

Erê, çavên min li beramberî ronahiya we girêdayî ne. Ez dewar im, ez reş im. Lêbelê ez dikarim rizgar bibim. Hûn reşine sexte ne, ey hewesbâzen req i çikûz. Ey bazirano, Tu reş i; ey dadperwer, tu reş i; ey general, Tu reş i: Ey IMPERETOR, ey xura kevnar, tu reş i: te ji şerbeta ku baca wê nedabû daqurtandiye, dirûstkirina destê seytan bû. -Penceşer û ta vi mileti dadiqurtînîn. Ên şehtiû û ên pîremêr cîgehê şanaziyê ne, lewra dixwazin wan bikelin. -Fêlbaztînîn tiş ew e ku em vê oqyanosê li cî bihêlin, ku şetî tê de digere taku wan perîşanan bi dîlan haş bike. Min hay ji welaêt rasteqîn ê lawên HAM heye.

Ma gelo hê ji tu nasyarê xuristê yî? An min binas? Wişê neman. Ez miryan di zikê xwe de vedişerim.

Hawar, defê lêdin, sema, sema, sema! Hetanî wê katjimêra ku ez dê bi ser nebûnê de bikevîm, nabînim, lê sipî ji keştiyê tên xwar.

Birçbûn, tîbûn, hawar hawar, sema, sema, sema, sema!

-Dûmahîk heye-

Mîna zimanê di dev de

Osman Şahîn

Wergê: Mustafa Aydogan

Ya ku di zuhayiyê de şenkahiyê û di zimên de gotinan diafirîne tu yî. Ya ku dilopan ji ewran dikişine û ber bi rûbaran dişine dîsa tu yî. Çavên dendikan tuneye, ew ji te fêr dibin û berê xwe didin tavê. Mêşen hunguv xwe li te datinîn, civik nêzîkî te difirin. Çewtiya te nayê zanîn. Li peyva te tête guhdarî kirin, hukmî te derbas dibe. Destê te hertim comert û bi bereket e. Min ji te nebibîstiye lê avêne te ji min re vê dibêje. Newalan ez netirsandim, qesa û sermayê ji ez netirsandim. Hewa sar, hewa bi berf, dema ku kincen te şil bûn, cara yekem te sincirandin û li pişta min girê dan. Eşen min dermanen xwe li ba te dîtin, laşê min bi te mezin bû. Dema ku ez dibetilîm min te cîwar dizanîbû. Ez mîna marmarokê ku derketine buharê li ser te vediketim û min xwe vedizeland. Gava ku lingê min şemîti û ez ketim, min di heriya te de li ber xwe da û ez bi tena serê xwe rabûm ser piya. Ez nexwes rabûm û nexwes meşiyam. Agirê yekem yê daweta min li ser te hat vêxistin. Demsal tê demsal diçin, hemû huner li ba te dicivin. Zerahiya pelan, sora-hiya mîweyan, cewhera keskahiyê û kulîlka wê li ba te ye. Ez barana te ya ku nuh dibare nas dikim. Berfa te ya ku nuh dikeve ji. Herdu ji di kefa desten min de hîn nuh ji ezmân dakteine. Ey ewliyeyâ ewliyeyan, ey dergeha rîncberan! Li ser kevîrê gora tu kesi nehatiye nîvîsandin ku ew ji birçîna miriye. Lî tu dizanî ku bê ew kesê/kesa ku li ser sîngî te veketiye ji ber ci miriye. Tu dizanî ku nefesa di bin nanê ku tê xwarin de, ya kê ye. Ey strana ku min di dilê xwe de nîvîsandîye! Ka bibêje, ger em tunebûna kê dê qedir bîzanîbû? Kê dê rûyê te yê bi gîha mist bida û bi zarekî şêrîn pesnê te bida! Ax, ez nizanîm bê ez xwe bikim qurbana kîjan hêla te; ma ew avêne te yêne ku di bihara te de kîfxweşiyê belav dikin, ma berfa te ya ku di zivistanen te de ya ji di havîna te de firîna hechecîkan? Dem hat ez li ber bayê te mîna gîhayê kil bûm. Dem hat ez li ser te şewîsim û dixana min mîna gulyê dara çamê ber bi esmanan ve bilind bû. Hey ax, ez tev vê ji dîsa bêî te sêwî, bêî te koleyekî cilimî me. Bêî te hêleke min vala, laşê min bê hestî... Ez bêî te, bîyê jiyanê me. Bêndera te kî li ber ba dike, kî ta'm dike, ez dizanim. Min dev da avêne te, min ji birçîna mîna zil-

zîfîkan, xwe li êmlikan danî. Ez ji bo te bûm qaçax û li ciya li navê min hate gerandin. Rojeke min ya kîfxweşiyê, hembêzkirinê çenebû. Ez bi salan e li ser te me. Bêhna min tevîli te bû. Lî ez hîn ji wek zaroken ku riya xwe winda kirine li te digerim. Ez zuha bûm, qediym. Ez êdî di bêçaretiya guiliyê darê yê şikestî de me. Ez dizanim ka bîvir çawan li darêne te û balyoz çawan li kevirêne te dikevin.

Hey kevintirîna kevnan! Ger tu ya min ba hey ax, ya min... Min dê rojekê ji siya xwe ji ser te xalî nekira, bawer bike rojekê bi tenê ji... Bila kincen li min ji xwêdanê biriziya û ez ji paçikan bibûma mîna dara ser tirban. Ez dê bixebitiyama û min dê serê sibehan rûyê xwe bi bereketa te bişuştâ. Min dê di te de rêz bi rêz koncal vekira û fidan biçikanda. Ez dê bibûma avkêsek û min dê bi tenekeyan av bikişanda, bidayê û mezin bikira. Min dê ew bikira dareke mezin û destmalen spî li dora dara wê ya ku yekemîn meywe bigirta, bigeranda.

Hey hevîrê bi quđret yê dînyayê! Tu ya ku ji ewr re sînor, ji ciyê re çeper û ji tavê re xetê datîne, nas dikî. Tu yê ku ji deriyê du alî de dikevê û derdikeve nas dikî. Desten wî yê spî te bibînin te nas nakin. Ji bo te dîlokên şînê, ji bo te stranan, ji bo te destanan nabêje. Di dawiya bênderan de li ber bereketa te sucde nabin û axa te maçî nakin. Ew li esmana, em li erdê; Başokeyê ku sal donzdeh mehan kîfî li esmana dike, qîymeta te ci dizane hey ax?

Tu mîna zimanê di dev de yî. Bê çawa mirovê bê ziman nabe, bê ax ji nabe. Hey ciyayê ku temenê min birin! Hey keça reşik ya dînyayê! Ez hatim ba te. Min navê xwe da te, bila ji te re be.

Ez bi agirê hesretê û têkoşîna hezar salî dizanim.

"DEVJÊBERDAN"

Franz KAFKA

Destê sibê bû. Kuç ú kolan paqîj û vala ne. Dema ku min katjimêra xwe û katjimêreke cîwaran dan ber hev; berê min li isteghehê bû; ez tê gîhiştîm ku ez pir dereng mame; iça pêwîst bû ku ez bîlezinim, ji tîrsa vê pêwîstiyê, min rîça xwe ji bir kir; çimku min bajar xweşik nedinasî. Ji bextiyariya min polisek li cihekî nêzik hebû; min bi alî wî de baz da bi matmayîn, min jê pîrsî:

-Ez berê xwe bidim kîjan rîcê?

-Tu zanîna rî ji min dixwazi? bi bisirînîn, ji min re got:


-Erê, madam ez bixwe nikarim bibinim, min got.

-Dev jê berde! dev jê berde! got, û mîna kesen ku dixwazin bi tenha xwe bikenin, bi yeklaşî zîvîri.

Çend gotin li ser dîwana Ehmed Huseynî "Bi xewna we pênûsê dilorînim":

Destkeftineke eşkere di riya pêşvebirina ziman û helbesta Kurdî de!

Brahîm Xalid



Ehmed Huseynî

(Foto: Armanc)

Berya çend heyivan dîwana Ehmed Huseynî "Bi xewna we pênûsê dilorînim" derket, û wek tê zamîn derketina dîwana an ji roman û çirokan di jiyana literatûra Kurdî de û bi taybet besê Kurmancî kêm in, mirov li hêviya gava ku bête avêtin dimîne û derketina vê dîwanê gaveke nû bû hat avêtin.

Piştî ku mirov vê dîwanê dixwîne, mirov nikare wê deyne ser kulînkê û ji bîr bike, ne ji ber ku ew gelek qenc e yan gelek xirab e, lêbelê ji ber ku nû ye, lemma mirov dixwaze wê serûbin bike û têbîgîhê ci serkeftin û ci kîmasî tê de hene.

Tevî ku serkeftin û kîmasî di dîwanê de li gelek ciha li kîleka hev in, lê ku mirov li rewşa helbesta Kurdî (besê Kurmancî) meyzîne û vegere dîwanê bibîne, mirov dikarê bêjê ku: li gor rewşa helbesta Kurdî dîwan bi giştî riwekî xweş dide, xwe dide naskirin weke serpêhatineke biserkefti. Li gor nerîna min tiştî herî gîring û qenciya herî mezîn ya dîwanê ew e ku helbest bi forma nû (aza) hattine nivîsandin û ev tiştîkî ne hindik e, çunkî bi rastî helbesta Kurdî- tevlî ku helbest besê herî pêşveçûyî ya literatûra Kurdî yegaleki çavşikesî û melûl maye di kirâsê xwe yê klasikî de li hember guherandinê ku di çand û tora cihanî û dor û ber de çebûne û çedîbin. Mebest ji vê gotinê ne ew e ku form bi tenê gîring e û ne ew e ji ku ci helbesta bi forma nû bê nivîsandin qenc e û yên bi forma klasikî xirab in, belê mebest ew e ku çenâbe bivê-nevê forma klasikî be, evê tiştî helbesta Kurdî şepirze kiriye û bîhna wê çikandîye û ew nikarê bîhna xwe bîne ber xwe bê ku monopolîya forma klasik bê şikandin û helbestvan E. Huseynî bê tirs milê xwe daye ber vî barî û bi rengkî aktif forma nû bi kar anîye, bêgu-man ev jê re tê nivîsandin weke destkeftineke mezîn.

Ji bîli formê hînedek tiştîn di hene kû ji aliyeke ve taybeti û nûperestîya helbestvan diyar din, û ji aliyeke din ve helbestan dixemîlin bi reng û wêneyên rîyala Kurd, rîyala şer û şikestinê, xoragîrî û bendewariyê, talankirin û barkirinê.

Ku mirov di helbesta "Şîno Can" de dixwine: "Bétaldeh û dîwar, te em li ber barana reş, mina çûkîn baskokirî hîstîn."

Yan ji:

"Me bar dikir û qantîrîn bînîçîkiyayî berya me diwestîyan, bi çavine girikî li me temâse dikirin û hêdi hêdi digiriyan..."

Yan ji di helbesta" Bûka agir" de:

...Rojhilat di xeftanê te de asê bûye!!

Rojava di çepkîn te de çebûye!! û hwd....eskere dibe kû kel û hilma helbestan ne ya wê kûrha kevn e ku ev bi dehan sal in helbesta Kurdî tê de tê neci-

a, çunkî helbesta aza di bin-

randin û hûnandin; helbestan hilmeke nû heye, û ne tenê ji ber kû /Çûkîn baskokirî/ yan ji

/qantîrê kû digirin/ tiştîkî nû ne weke wêne, lêbelê çunkî li gel wê, helbestvan tiştî xwestî rehet û bê rapêcandin û kelandina zêde gotiye -ev yek-. Ya didwa û herî gîring ew e kû tiştî helbestvan li ser nivîsandî di van helbestan de (şikestin, nexwes halî, bar-kirin, hêvidarî û bendewarî û...) tiştîkî ne nû ye di helbesta Kurdî de, lê ewî, bi şeweyekî nû li ser nivîsandiye, ji ber kû heta niha ne ber bi hiş bû ku mirov helbestekê li ser van tiştî bixwîne bê ku gotinê weke (feleka xayîn, derdî giran, roja reş, birîna kûr, qîrîn û hewar û hwd...) tê de nebin û mirov dikare bêje ku ev gotin gelekî din ji weke wan bibûne weke yedek, helbestvanan gelek caran ew bi kar dianîn dema ku li gotinê di nehatibana ser zimanê wan û tiştîkî gelek gîring e ku helbestvan gotinê xwe û wêneyên xwe ji derveyî vê ferhengê anîne. Her wiha bikaranîna hînedek gotin û zardev yê ku cihekî taybeti di psikolojiya mirovê Kurd de hene weke: (Heko, kezbeh, şerîne, şîno can) yan ji çandina parçeyek ji sitrana mamoste Mihemed Şêxo de bejna helbestê de hishtine ku rîjandina helbestê gestir bibe, kela xwendevan germitir bibe û naverok nêzîktî wî bibe.

Ji aliye vokabûlarê ve, bêgu-man helbestvan xwediyê vokabûlerêke paqîj û dewlemend e û ewi desteyek gotin bikaranîne ku berê li ser destê helbestvanen di yan gelek kêm dihatin bi kar anîn, yan ji bi carekê re nedihatın bikaranîn û gelekî gîring e ku şeweyê gotinê (axftina helbestî) ya helbestvan taybet e û ev ji nasnameya wî ya helbestvan bi hêz-tir dike.

Lê ligel vî riwê pozitîf yê ku dîwan pê tê naskirin, hînedek kîmasî ji tê de hene. Yek ji kîmasiyen dîwanê vokabûlera helbestvan e, weke berê hate gotin, helbestvan vokabûlerêke paqîj û dewlemend heye û mirov dikare bêje ku vokabûlera wî elementê nû xistine ferhenga Kurdî û ew pêşve biriye, lê ev vokabûler gelekî ofisiyel e (resmi ye) û gelekî akademî ye û giran e ji bo helbesta aza, çunkî helbesta aza di bin-

geha xwe de çebûye ji bo ku helbest, naverok û saza wê, hilm û bêhna wê bigihê xwendevan û guhdaran bi şeweyekî hêsan û rehet û bi zimanekî nêzîkî zimanê nav malê yê rojane.

Evê vokabûlera giran li hînedek cihan ziyanekî eşkere kiriye, helbest giran kiriye û saza wê kêm kiriye û di wan deverên wilo de helbest bûye weke ku hatibe wergerandin ji zimanekî biyanî.

Kîmasiya din ji ew e ku teví ku helbestvan bi forma aza nivîsiye, ewî nikariye heta bi dawî xwe biparêze ji zordesiya forma klasik û leyistika wê, ew carcaran vegeriyaye bin siha wê, gelekî mijûl bûye bi hilbijartina gotinan û formê ve û weke nimûne mirov dikare evan devere darîçav bike:

Helbesta" Bûka agir" rûpel: 18
Şevger,
payîza pirçzer, digindirin
zarokîn bi şîrvekîri,
çavşîkîn şîmakîri,
digindirin
zimanê jêkirî,
xwîna xwe dimije, digindire

.....
Her wiha rûpelên 24 û 25 yên vê helbestê, di van rûpelan de helbestvan gotina Hekarê ji hev ve-kiriye û formeke wisa bi kar anîye, ku di bin her tîpekkî ji tîpen gotina Hekarê de parçeyek helbest were danîn ku ji wê tîpekkî bi xwe dest pê bike, û di vir de formê gelekî zordesiya li helbestvan kiriye, ewî kar bes ji bo wê kiriye û ji bo ew (forma) sejet nebe ewî hînedek parce helbest danîne-bi taybet yê li bin Ê û R- ku di avakirina wa ya helbestî kîmasî nînin, lê ew ne ligor helbestê ne, hînedek beloq in û nakevîne kirâsê helbestê de.

Van kîmasiyen ji vî rengî siha xwe avêtine ser hînedek cihê di ji û bi taybet helbesta "Zerdeşte bi-harâ" û evê xalî hishtîye ku rijandina (herikandina) helbestî sist bibe, naverok li ber xwendevan belav bibe û kela wî sar bibe.

Lê ligel van kîmasiyen dixwazim careke dî bêjîm ku bi rengekî giştî dîwan xwedî malbat e (bi esle) û xweş e, û destkeftineke eşkere ye di riya pêşve birina zimanê Kurdî û helbesta Kurdî de û hêjaye ku ji aliye hemû xwendevan ve bê xwendin.

Weşanênu Nuh



Münzûr Çem
TAYE KILAMÊ DÊRSIMÎ, Stockholm, 1993, 321 rûpel, Dimili.
Taye Kilamê Dêrsimî (Hinek Sitranê Dêrsimî) ji alî nivîskarê Kurd Münzûr Çem ve hatîye nivîsin. Münzûr Çem ji Kurdistanâ Bakur ji Dêrsimî ye. Ji 1970'yi û vir de ye bi Tirkî û Kurdî dinivîse. Wî heta nuha bi navê H. Toprak, Ahmet Taş, B. Şilan, Mîrzâli Çimen, S. Dilan û hîn geleken din nivîsiye.

Kitêb ji pênc beşan pêk hatîye: 1- Sitranê şerîn eşrân, 2-Sitranê li ser şerîn Kurdîn Dêrsimî û Dewletê , 3- Sitranê hezkirinê, 4- Sitranê li ser meselîn din. Beşê pêncan ji Ferhengo-keke Dimili-Dimili ye ku nivîskar di vê ferhengoka xwe de gotinê ku di sitranan de derbas dibin esas girtîye û li hember wan bi Dimiliya mintiqê din nivîsiye. Nivîskar her weha bi not û şirovekirinê sitranan ev karê xwe hê dewlementir kiriye.

Kitêb ci ji alî folklorâ Kurdî ya Dimili be û ci ji ji alî hin bûyerên tarixî yên Dêrsimî be bi materyalîn folklorî ji bo kesen ku li ser folklorâ Kurdî an ji li ser tarîxa Kurdî dixebeitin çavkanîyeke baş e.



WAN (Kovara Yekitiya Nivîskarîn Kurd-Swêd) no: 6 (1993), 148 rûpel, Kurmancî, Dimili, Soranî.

Nivîsên vê hejmarê: Gola Wanê-E. Huseynî, Qedri Cemîl Paşa-H. Hisyar, Umêd Mehdi(Hendrên)-E. Huseynî, Letif Helmet-Xelîl Duhoki, Mîrê Emgiyonê Gunnar Ekelof- M. Ali K., Helbestin ji İbrahim Yusif, Geşta Feqîya- E. Narozi, Hevokek ji xwîna min-M. Keles, Rewşen Bedirxan- Konê Reş, Hezaremîn Hêk- P. Çhanî, Dûgerê Felegê- S. Behrengî (w. M. Lewendi), Helbestin ji Melayê Cizîrî, Nalî, Reşîdê Kurd, Sîsîrê Hesînî-3- S. Berekat (w. E. Huseynî), Pirtûkên Nû- M. Lewendi, Dîsa Li Ser El-fabê- Malmîsanij, M. Lewendi, Heta Key- M. Çem, Keçelek- J. Espar, Giftûgoyek le gel A. Şamlû- Beroj Akreyî, Lîgerêni mirov bijî- w. X. Arif, Diwanî Wan: Şérko Bêkes, Margot Bikel, Stig Dagerman, Sadî Yusif, Nale Hefid, Mîrafî Bêxayekirawî Servantes- M. Kundera

Zeynelabidîn Zinar

XWENÇE

CH.D VI
Kitab, Serpîhatî, Meselok & Çirok



Zeynelabidîn Zinar; Xwençe, cild: 6 (Kilam, Serpîhatî, Meselok û Çirok) Pencînar; Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm, 1993, 266 rûpel, Kurmancî.

Kitêb ji çar meselokên Mele Nesreddin (Melayê Meshûr) û piyesekê bi navê "Şehîd" pêk hatîye. Nivîskar çar meselokên Mele Nesreddin ên ku berê bi Tirkî û Kurdî hatine nivîsin kirîye wek piyes. Her-weha di dawîya her piyesekê de bî kur tî Swêdiya wan ji nivîsiye.

M. Sıraç Bilgin; Barzani'n Son Yılları, Kürdistan'da Çok Partili Sistem, 1975-1979, (Salen Dawîn ên Barzani, Li Kurdistanê Sistema Pir Partitîyê, 1975-1979) Hiddekel Förlag, Stockholm, 1993, 151 r. Tirkî.



LOKMAN POLAT

TORINA ŞEX SEİD



WESANEN HÊVIYA GEL

Lokman Polat; Torina Şex Seid, (nîvîs û çirokên kurt) Weşanen Hêviya Gel, 1993, Stockholm, 112 r. Kurmancî

amadekar:
M. Pakdemir

OSMAN SEBRÎ DİNYA XWI BEDİLNAY

Malmîsanij

-II-

Zamay Osman Sebrî vatnî demewo ki Osman Sebrî Madagaskar di biyo, tanî Madagaskarijî ebi ziwanê Frensizkî tira persay vato "Ti kam dewleti ra yî?" Osman Sebrî Frensizkî nêzanawo, vato "Ez Sûrî ya" (yanî "Ez Sûriye ya"). Aya ser ra ay Madagaskarijî hing-hing bide hiway. Çende rey tira persay vato "Ti kam dewleti ra yî?", yê zî timo vato "Ez Sûrî ya." Ey çende ki vato "Ez Sûrî ya" ê hiway. Çunki Frensizkî di merrî ra vanî "sûrî" ("souris" nusiyêno).

❖❖❖
Qali yena qali Osman Sebrî vano:

-Ez 'emirdê xwi di semedê nuştîşê xwi ra caran yew quruş nêgêna. Malê şarê (xelqê) min o. Mi hêgây xwi zî mérdimanê xwi û dewijanê xwi rê verday. Faîq Bucaqî semedê 'erdan (hêgayan) dewijan reydi da pêro. Mi dey rê xeberi erşawiti, mi va "Yan de'wa Kurdey ca di verdi yan zî wina karanê tewşan meki!" Dima vano "Mérdim senî vano ganî wina biko zî."

Ma behsê kovara Tîrêji kenî, o ma zaf çî nêhesibneno, fikrê yê çiyo ay vano:

Tîrêji ze'if a. Ez hema zî telebanê xwi ra kelimeyan pêser kena.

Ü defterê xwi yo ki te de kelimeyan nuseno, ma nawnen. Hewawo ki vano, ders dano xortanê Kurdan.

Dewam keno, vano:

-Kovara Hawar û Ronahî di, nuşteyanê Celadet Bedirxanî, ey Qedîrcanî, ey Nûreddin Zazay, ey mi biwanî; ziwanê xwi aver berê-nê. Ez û Celadet ma heta fikrê sîyasî ra wina bî (giştanê xwi pêra viyarneno, wazeno vajo ki ma ziddê yewbinan bî, ma pê nê-kerdînî), labelê hetê ziwanî ra mîrek xurt bi.

Qali yena Cigerxûnî ser, vano: -Şâireya Cigerxûnî baş a. Hetanî ewro ma miyan di yê ra xurtê şair hima hima ki nêvejî-yawo. Labelê hetê ziwanî ra ze'if o. Çi çiyo ki fam nêko, vano "No Kurdkî niyo."

Gama ki qalê Kurmançkî û Sorankî keno, vano "Lehça Kurmançkî Sorankî ra pêtêr (zengînêr) a." Qalê Kurdanê Ermenistanê Sovyetî zî keno, vano "Çend serrî yo Kurmançkî nusenî labelê Kurmançkîya yînî zaf aver nêsiya."

Mesela yena siyasetî ser, vano "Ez sosyalist a. Labelê dînperwer (dinci) zî bibî marksist zî bibî

Kurdî ganî ewro yewbinan di dişmeney nêkî. Xelisiyayîşê welafti ra pey a zî bina."

Ez wazena ki yê hîna zaf bida qalikerdiş, ci fayde ki nêwazeno qalî biko. Ez zî nêşina hîna zaf ri ser na. Vano:

-Eke derheqê yewî di mi ra çî personî, ez vana "Ez nêwazena pey yê di qalê yê bika. Şerî yê biyarî, ez rîy yê di vaja". Vanî "nîno". Ez vana "Eke nîno mi berî yê heti". Ez eşnawena ki pey mi di zî tanî 'eleyhê mi di qalî kenî.

Ma ti ra vanî "Apo", o zî qalikerdişê xwi di ma ra vano "Apo", halbiko ma herrinda gedeyanê jey di yî.

Ez ki yê gûşdarena, ez xwi pîze di vana "No tarîxê ma ra yew parce wo" û ez pîrey û tenamendiş yê ver kewena. Hinî tam kewto, bardaxa lîmonataya ki keyneki arda, destê yê di recifiyêna, hima hima ki nêrişena. Kê fam kenî ki verî, ciwaneya xwi di camêrdêdo şidêneye biyo. Heyf! Zeman zorê mérdimî beno, tehemmulê wucûdî sinorkerde wo.

Terraqi miyan di ez tira vano "Ez demeyê Kolik di menda", vano "Eke wina bibo ti halê cay ma weş zanî."

Qalikerdişê yê, telaffuzê yê zaf Kolikijan nêmaneno, labelê 'eynî heway yînî vano "Üsman".

Ma vanî "Ma keyfweş i ki ma ti zîyaret kerdi" û ma tira xatir wazeni, Rojen Barnas wazeno destê yê muçî biko û vano:

-Ez zaf destê çewî muçî nêkî, labelê ez wazena destê to muçî bika.

Dat Osman vano:

-Şîma ganî destê çikesî muçî nêkî, bander mebî.

Û nêverdano Rojen destê yê muçî biko. Ebi pîjeman heta berê teberî ma reydi yeno. Key yê di a keyneki vişer yewna çino. Ma teber kewenî û dekewenî kuçanê çewt-çewtvirranê Mehla Ekradî miyan. Kuçan di vengê Kurdan yeno, Kurdkî qalî kenî. Şew a.

Mi bi xwi tena a ray Osman Sebrî dî.

Serra 1985 di zî mi yê rî yew mektub nuştbî û ez tira derheqê Kurdzade Ehmed Ramîz û Kemal Fewzî di tanî çiyan persabiya. Mi rî no cewab nuştbî:

Şam, 11. 2. 985

Hevalê hêja Malmîsanij,

Nameya te gîha destê min, gerek mixabin ku dê nikaribim bi kîrî te bim. Li ser herdu rehmetiyan tîstekî nizanim. Sedema vê



"Xebata gel divêtin pirr fedakarî di her warî
Bi qasî wê zêdetir hîn eqilmendî û hisyari"

nezanîna min, ew kesên ku bi herdu camêran ra hevalî kiribûn û tiştek li ser kir û xebata wan ji me ra negotibûn.

Ma tu bawer dîki ku ev cara pêşîn e ku navê Ahmed Ramîz ji te dibihîsim. Ev camêr nehatîye Sûrîyê, heke hatibûna min dê binasiya. Ez di dawiya sala 1929'an da hatime Sûrîyê û derbazi Xoybûnê bûme û tê da xebitîme lê min ev nav nebibîstiye. Herçî Kemal Fewzî min navê wî bihîstibû, bawer im ku navê wî di nav nivîsarek min da borîye. Lî gelek fîhêt e ku em tiştekî li ser jîn û xebata wan nîzânîn. Sûcê vê yeka han vedigere ser kesên ku digel wan hevalî kiribûn û ji me ra bi ser û ber negotibûn. Ma ne bi sedan kîmasî û çavnebaryîn holê bûn ku berê min guhaste serrê borjuwaziyêndî Kurd?

Silavîn min bêjî hemî birayênen me yê li Fransa, nemaze xwedîyê navnîşan Yûsif Kaymak. Digel rûmetgîriya min.

Divê hûn bizanibin ku nameyen ku bi poste têr heke ne taahhudî bin pirrcaran nagehê destê me.

O. Sebrî

Cend serrî tira pey, Şiyisê Temmuza 1987 di Stockholm di ez key Mehemed Bekirî di biya. Cenîya yê Hêvî, keyna Osman Sebrî ya. Ez Hêvî ra persaya mi va:

-Dat Osman Sebrî gedanê xwi rî senîn bi?

Va: -Hewawo ki vanî, ma ra ver birayanê min ê pîlan rî sert biyo. La mi bi xwi rî sert nêbi.

'Emrê xwi di ez vana qey yew-di lekmâfi day mi ro. Sewbî ma ra zaf hes keno, mesela maya ma ra zafer ma muçî keno.

-Vîrdê to ra çend rey dekewt hepisxane?

-Reya ewîşya ki mi vîr yena, ez sinifa çarini di biya, amey berd. Ez te de zaf dejaya, ez yê ver kewta, bermaya. Ez caran xwi vîr a nêkena. Pijemey pira bî, nêverda ki cilanê xwi xwi ra do. Polîsî tersaynî ki biremo. Berd 'ereba miyan hima verda cilanê xwi xwi ra do.

Yewna rey maya maya mi, yanî dapîra mi ki dîna xwi bedilnay, ay wext polîsî amey, waşt ki yê berî. Reyanê bînan polîs ki ameyîn Bawo sakîn şînî. Na rey hêrs bi, cigîriya. Polîsî o şinasnayîn, va:

-Qey ti hêrs benî? Ti wina nêbî.

Yewî va "Vistirîya yê dîna xwi bedilnaya". Polisan soz da va "Ma emşo yê verrâ danî". A şewi ma pawit, zaf erey ame keye. Dima her roj şînî, "îfadé dayînî".

Wina fam beno ki ay deme Osman Sebrî binê kontrolî di biyo û her roj şîyo qereqol di imza daya.

Hêvî va: -Yew rey zî demewo ki Lubnan ra agêrayîn, yewna şaristan di polisan Bawo tepîşbi. Semedo ki xebera polîsê Şamî tira çinêbî, ê zî amey keye di -Şam di- yê geyray. Mevaji ki ay hing di o ay şaristano bîn di destê polîsî di yo.

Vatişê Hêvî gore, cengê 'Ereban û İsrailî di, hukmatî Sûriye di herkes hepisxane ra verrâ dawo, Osman Sebrî û di casûsî tena ver-

ra nêday.

A ki wina vana, mesela Çewres û Newan (Kirkdokuzlar) mi vîr kewena. Turkiye di zî darbeya 1960 ra pey mehkumê siyasi heme verra day, çewres û new mehkumê siyasi yê Kurdan tena verra nêday.

Mêrdey Hêvî Mihemed Bekir zî behsê Osman Sebrî keno vano:

-Yew deme polîsan ta'da Dat Osmanî kerdi. Dat Osmanî vatnî "Ez dekerda yew hucreya werdiyekî, mi nêşinayîn xwi te de raşt bika. A hucra di, hetî ra zî dalpey mi ro ameyîn." Polîsî zaf îşkence Dat Osmanî kerda, tira çîyê persay, Dat Osmanî verî vato "Ez nêzana", hewniyawo ki tira fek verra nêdanî, peynî di vato "Ez zana labelê ez şîma rî nêvana!" Aya ser ra teseliya polîsan ti ra kewta, hinî fam kerdo ki o qalî nêkeno, fek tira verra dawo.

Na mesela Dat Osmanî zî mesela 'Ubeydullah Eyûbiyan ardi mi vîrî. 'Ubeydullah Eyûbiyan, Kurdanê Kurdistana Rojhelatî ra yew nuştox o. Vanî dewrê Şahî di Íran di Kurdey ser o îşkence dîbî. Wextê Xumeynî di zî rojî yê tepeşenî. Îşkence bide kenî, ti ra Şêx İzzeddin Huseynî û 'Evdirehman Qasimloyê rehmetî personî (Qasimlo ay wext hima weş o). 'Ubeydullah Eyûbiyan vano "Ez yînî ra hes nêkena!" Vanî "Qey?" Vano "Fîkrê yînî şâş o. Çimkî yê otomînî wazenî. Ez otomînî nê, xoserbiyayîş wazena."

Wa ganê Osman Sebrî û heme şehîdanê Kurdistani şad bo.

Çend gotin li ser Idrîsî Bîdlîsî...

Bi kurtî naveroka peymana begên Kurd û Osmaniyan weha bû; Mîrên Kurdan itaatê Sultan Osmanî diperjirînîn, di şeran de bi yekîtîyên şervanên xwe bêşdar dibin, lê, hemû mafen xwe yên hukumraniyê diparêzin û li hember êrîşen ku ji derva tê Osmanî wan dipareze.

Sultanê Osmanî ji nu va avakirina awayê idarî yê Kurdan serbestî û baweriyeke temam dabû ji Idrîsî Bîdlîsî. Eyaleta Dîyarbekirê bo 19 sancaxê dihat parvekirin, 11 ji van di bin tessarufa Sultanê Osmanî, 8 ji wek "Yurtluk û Ocaklık" bûn.

Idris, li ser navê begên Kurdistanê ji Sultan re raporekê pêşkeş dike; ji Sultan wazifeyêwan i ırsî weke berê ji wan re bêndayîn û ji bo ku biçin Waliyê Safevi Kara Xanê ji Diyarbekirê derxînin, daxwaz dike ku bi rûtbeya Beylerbeyi (Mîrêmiran) li serê wan şexsifetek mezin bê tayîn kirin. Sultan; "ji nav hûkûmdarên Kurdistanê yekî ku bikaribe wazîfe Mîrêmiran li ser xwe bigre hilbijerîn ku hemû begên Kurdan itatafî wî bikin û dibin seroktiya wî de li dijî Kizilbaşan ser bikin, wan ji welêt derxin" r.481.

Li ser vê yekî Idrîsî ra-

manwer raporeke din ji pêşkeş dike û weha dibêje; "Li vir ji yekîtiya îradî zêdetir piranî hene; herkes "tenê ez bim, ji bilî min kes nebin" dibêje; û kes ji kesî re iteatî nake. Ji ber ku armancaya bilind ev e ku, tedbirîn ji bo cîvata Kizilbaşan bêñ sitendin û yekîtiye wan bêñ tarûmar kirin; di vê rewşê de, baştır e ku ji kesen Seraya Sultanî yek bê tayîn kirin ji yêñ ku hemû begên Kurd itatafî wî bikin, bi vî awayî ev kar bi leztir û bi awayeki herî bas temam dibe". Li ser vê yekê derbarê tayînkirina Çavuş başî Mehmed Axa yê ku wek Biyikli Mehmed tê naskirin wek Begêbegân yê Eyaleta Dîyarbekirê û Qamûtana Gişî yê Ordîyê Kurdistanê yêñ ku armancaya wan bi paşvegitîna eyalete ji desten biyanîya û têxe bin ewleyîya xweye emîrnameyek derdikeye.

Ji Begêbega yê Dîyarbekirê bi dehan caran êrîş têñ li ser Mîrîtîyên Kurdan. Heta ku ji holê rabin...

III

Ev peyman di dîroka Kurdan de roleke gîring dilezîye; bi başî û bi xirabî... Hakîmiyeta begên Kurdan li heremê pêk tîne. Şerîn İranî û Osmanîyan dom dike. Şer di vê heremê de pêk

tê rû didin. Herema tampon timî di bêistîkrarîyeke krownîk de dijî. Potansiyela Kurdan tarûmar dibe. Begên Kurda loma statûya vê peymanê nikarin bi kar bînîn, di nav xwe de merkezibûyînekê (her çiqas ceribandinê weha piir bin ji) ava kin. Divê mirov sedemîn merkezinebûyîna mîrîtîyên Kurda ne tenê di sedemîn derva û realîteya wan i geopolitik de bigere. Sedemîn hundirîn; yêñ sosyolojik ji divê kêm neyîn ditin. Çawa ku tê zanîn di vê demê de, şûura netewî kêm e, insan û civat aidiyeta xwe di motivasyoneke neteweyetî de nagerin. Dewletbûyîn û yekbûna civatî di bingeha şûura netewî de pirseke sedala 18'an e. Ji bo civatîn rojhilat û Kurda hîn ji nêzîtir. Ji bo Kurdan di dema qırma navîn de dîneki müşterek yê hevîkirina kulturi, civakî û idarî ji tunebû. Dewlet di vê demê de bi darê zorê çedîbû, lê li ser meşruyetekî dîni xwe diparastin. Dîni ji pîrozîyek dida dewlet û hukumdarân re. Dewlet dibû hamîya tabîi ya tebaayan.

Pêşketîna Tirk, Ereb, Fars, Moxol, Yunanî, Bîzans hwd bi istîla û dagirkirîye pêkhatîye. Dorhêla Kurdan bi suran hafîbû girtin. Kurd mecburyî para-

stina hebûna xwe bi veraseta meşru yê ji bav û kala mayî, bisinorkirîbûn. Di wan mercan de motivasyonê xurt yên dagirkirinê di nav wan de çenêdibû. Civata Kurd bêtir bi aloziyê hundirîn ve bi keftelefît bûn.

"Xamîyet û bilindî" nedîhiş itaatê ji hevûdu re bîkin. Ev realîteya cîvakî, sîsistema parastina mîrîtîyân li hember polîtikaya merkezibûyînê her du împaratorîyan di derhola wan de zeif kirîye. Her du împaratorîyan mezin heremê di bin tahakkûm û hakîmiyeta Mîrîtîyâ de ji bo ku ji warêñ xwe yê meşru yêñ tra-disiyonalî dernakevin iñtîmam dikirin. Tevî vêya ji,

gelek mîrîtîyên Kurd li ser esasen nîrxêñ wek; şervanî, parastina nîrxêñ tradîsiyonalî, bikaranîna hunerî dîplomasîya heremê (herçiqas kultura me ya siyasi iro vê qebûl neke ji) li ser xwe mane. Mîrîtîyâ Kurd ya Bîdlîsî tevî hilweşandin, rabûn, tevlîhevî nêzikî 850 salan serxwebûna xwe parastîye. Sadaqatîn xwe ji împaratorîyan mezin yêñ here-mê re ji ber parastina vera-seta vê serxwebûyînê, anîye.

Vê rewşê bi vî awayî heya salen 1800'an dom kirîye. Ta ku êdi her du împaratorîyan mezin yêñ heremê dest bi polîtikaya merkezibûyînê kirine. Maksîmalîzma Kurda di

famkirina rastiyen de gelek zorê dikşîne. Nepejirandina realîteyîn geopolitik û sosyolojik yê Kurdan ji di nav vê de ye. Rewşa geopolitik - di navbera du împaratorîyan mezin de bûyîn-, Kurdistan tim wek "heremeke tampon" hiştiye. Mîrîtîyên Kurd tim pêwîstî itîaañ bi yek ji wan re bûne.

Hemû dewletîn piçûk, mîritî û eyaletîn tampon di prosesa merkezibûyîna dewletîn mezin de ji holê rabûne.

Polîtika, hûnerî bikaranîna imkanan e. Îmkan tûne-bin, raman û îdealîn herî bas ber bayê de herin. Ne peyman, lê, nebikaranîna imkanan peymanê bûye sedemîn drama Kurdan.

Almanyayê û Fransayê komele...


Derve yê Almanyayê Klaus Kinkel qedexekirina faliyeteñ PKK'ê dianî zimên: "PKK di danûstendinê me yêñ bi Tirkîye re bûbû astengek mezin. Lê em çiqas terora PKK'ê rûres dikan, em ewqas ji daxwazên Gelê

Kurd ku li Rojhilata Tirkîye êşê dikşînin, fehm di-

kin". Béguman têkiliyê aborî û diplomasî di navbera Tirkîye û Almanyayê de bûn sedem ku hukûmeta Kohl, komele û buroyen aligirêñ

PKK'ê li seranserê Almanyayê bigre. Lê eşkere ye ku metoda xebata dilxwaz û aligirêñ PKK'ê ya li Ewrûpayê ji di vî warî de rola xwe list ku hukûmeten Almanya û Fransayê komel û buroyen wan bigrin.

ŞEHÎDÊ NEMIR HATİP KAPÇAK (XEBAT) DI TEKOŞİNA GELÊ KURDISTANË DE DIJÎ



Lawê Kurd yê hêja, têkoşerê serbilind, dozdarê rizgarîwaz û azadiya gelê Kurd, pêşengê bi rûmet û mîrxas, endamê Komîteya Navendî ya Rizgarîwazên Neteweyî yê Kurdistanê (RNK - KUK), Hatip Kapçak (XEBAT) di 18-ê Çiriya Paşin ya sala 1992-an de, li Şermix (Mazîdaxê) ji aliye hêzîn tarî û kirêt yêñ dijmin ve hat şehîd kîrin.

Bila dijmin baş bizanibin ku ne tu hêz ne ji erîşen weha hov û kirêt nikare têkoşîna neteweyekî bindest ku di zanebûna rûmet û giranbahiya serxwebûn û azadiyê de ye û ji bo vê armanca pîroz ji tu fedekarî û canbêzariyê xwe nadî alî, bide rawestandin. Kulîkîn serxwebûn û azadiyê ku bi xwîna şehîden Kurdistanê têñ avdan, roj bi roj bêtir û gestir dibin.


Bi munasebeta salewexta şehîdkirina pêşengê hêja heval Hatip Kapçak (XEBAT), em careka din soz û peyman didin ku emê heval Xebat û hemû şehîden Kurdistanê, di xebat û tekosîna gelê Kurd de bidin jiyandin.

Hezar rîz û silav li şehîde nemir Xebat û hemû şehîden Kurd û Kurdistanê...

*Sonda me mirin e, di riya te de welat
Kefen û kirasen me ne, ferman û xemîl û xebat
Xwîna me hat firotin, pê bikirin Kurdistan
Em dilitîyê naxwazin, pir bi rûmet e goristan*

Rizgarîwazên Neteweyî yê Kurdistanê (RNK - KUK)
Berpirsiyartiya Ewrûpayê

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1.a- Helbestvan û têkoşerê Kurd. Di sal 1905'an de li hêla Semsûrê tê dinê. Pişî serhildan Şex Seid mişextî Sûriyê dibe. Di kovarê Hawar û Ronahîye de gelek helbest û nivîsen wî derketine. Bi navê "Elfabeya Tekfûz" li ser albabea Kurdî ya bi latînî pirtûkek çap kiriye. Di 11.10.1993'an de û 88 saliya xwe de li Şamê mir. 2.a- Lî belê, feqet b- Roj, hetav (berevajî) c- Xwarina dewaran. 3.a- Li Kurdistanâ bakur deveker ku bi navê serhildanê tê nasîn. b- Di devoka Behdînî de "vir", "vêde". 4.a- Paşnavê helbestvanê Kurd Mele Ehmed b- Rêbir, eşqîya. 5.a- Sino-

nîmeke "iro". b- Bi soranî "neynik, mirêk". 6.a- du tîpêñ wek hev. b- Ageh, jê xeberdar bûn. 7.a- Mam, birayê bav. b- nexweşiyek c- Hevîr yan heriya wek benîş, zeloqî. 8.a- Ji navê qîzan b- encam, netice. 9.a- Welatek ku cîranê Kurdistanê ye. b- baneşanek c- Sînonîmeke "ji bona ku" 10.a- Ne ronahî, ne ron (berevajî) b- Paşnavê kurdzan û konsolosê Rûs yê di ku di dawîya salen 1800'an de li Erzûrûmê bû û li ser şairê klasîk yên Kurdi pirtûkek nivîsandiye. (berevajî) 11.a- Hîn, hêsta (berevajî) b- Kesê ku çavêñ wî/ wê reş 12.a- Qurîş Rûsyâye b- navê rojekê(berevajî).


Bersîva hejmara berê

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
M	E	L	A	Y	E	B	A	T	E	D	
H	R	O	I	N	E	L	T	O	E		
A	M	E	D	S	I	N	E	R	E		
I	E	L	A	Y	E	G	C	I	Z	R	I
D	E	M	O	K	A	Y	A	L	A	N	O
I	X	A	G	O	D	E	N	E	R	E	R
Y	A	H	A	B	R	I	R	E	M	A	N
E	N	T	R	E	K	R	E	M	A	N	O
I	T	U	K	R	E	M	E	N	A	S	T
Z	A	N	E	R	E	B	R	E	T	U	G
O	S	M	A	N	S	E	B	R	T	U	G

Di salvegera 13.a şehîdketinê de xuşka xwe Necla û hogirêñ wê bi bîr tînim



Necla Baksî



Huseyîn Aslan

Di 12.12.1980'yî de xuşka min Necla Baksî û zavê me Huseyîn Aslan û hogirêñ wan bi destê hêzîn kolonyalist ên Tirk û Sûriyê hatin kuştin. Ez wan wek neferîn têkoşîna me ya netewî û sosyalîzmê bi bîr tînim û li ber giyanê wan ê pak bi rîzdarî radiwestim.

Şukran Baksî

Kultur û Politika

Riza Polat

"Dawiya dîrokê û mirovê dawî"

Ev sernivîsa li jor navê pirtûkekê ye ku ji alî dîroknas û sosyologek Amerikî hatîye nivîsin. Nivîskarê pirtûkê Francis Fukuyama ye, navê pirtûkê yê orijinal jî "The end of History And The Last Man" e.

Dîroknas û sosyolog Francis Fukuyama pişti têkçûna sistema sosyalist, dighiye wê qenaatê ku mirovayetî û cîvatân wê gîhiştine qonaxa dawî ya pêşketina civaka mirovayetî yê, qonaxa herî dawî ya pêşketina civakê dewleta liberal e, yan jî bi na ve kî din ekonomî û demokrasiya liberal e. Fukuyama pêşî fîkrîn xwe wek meqaleyekê bi navê "dawiya dîrokê" di kovara "The National Interest" de belav kirin, lê pişti ku munaqşeyen dûr û dirêj li ser hatin kirin, wî wek kitêb nêrinê xwe çap kirin.

Fukuyama van baweriyênen xwe li ser fîkir û nêrinê Karl Marks û Georg Fredrich Wilhelm Hegel ava dike. Qeneeta wî ew e ku ne Marks û ne jî Hegel bawer nedikirin ku pêşketina civaka mirovayetî bê dawî ye û heta heta wê dom bike. Wan herdyan jî qebûl dikirin ku dema ku mirovayetî gîhiştî awayê ku civata mirovayetî hesreta wê dîkişîne, wê demê rola hêzên ku dîrokê dilivînîn wê kêm bibe. Mebesta wan ne ew bû ku wê dawîya mirinê, dayîkbûnê, jiyanê, keşîkirina tiştên nû û bûyerên mezin bê. Lê qeneeta wan ew bû ku pişti helbûna problemen mezin di jiyanâ mirov û cîvatan de êdî jiyanekê bê problem û bê fîrtone dest pê dike.

Ji bo Marks hêza esasî a livandina dîrokê dijayedîya di navbera cîna serdest û bindest û di kapitalizmê de jî cîna karker û bûrjûvazî de ye. Dijayedîya ku pişti cîvata komunal heta nuha ya ku dîrok dilivand, dijayedîya di navbera cîna serdest û bindest de bû.

Ji bo Hegel jî hêza ku dîroka mirovayetî dîlivand û bi pêş dixist; hewcedariya ku xwe bide pejirandinê (qebûlkirinê) ye. Hewcedariya xwe bide qebûlkirinê hîsîn ku girêdayî wê, hisîn wek hêrsbûn, şermîkirin û qaretî di hebûna mirov û politîka wî de ew xusûsiyet in yên ku di roleke mezin dilizîn. Ji ber vê yekê jî Fukuyama ji Hegel hereket dike û dîbêje "ji bo Hegel ew tiştên ku dîroka mirovayetî dîlivîn ev hîs bûn."

Di xusûsê pêşketina livandina cîvata mirovayetî de Hegel û Marks hemfîkir in. Lê nehemfîkirîya wan, li ser hêzên ku cîvata mirovayetî dîlivîn bû. Lewra Marks di got "diyalîktîka Hegel serbîjîr bû, û li ser lingan ranedîwestîya. Serserki dimeşîya, lê min ew serrast kir û danî ser lingan".

Fukuyama iddia dike ku pişti şoreşa Oktobrê û hebûn û berdewamîya sosyalizmê li dunyayê qeneetek wisa li cem alimên rast û çep durust bûbû ku êdî nema dawîya sosyalizmê tê. Li cem dewletîn împeryalist û alimên wan panîkek wisa çebûbû ku texmîn dikirin her roj erd ji bin linîgê wan diherike. Ji bo wê jî ew du

mîsalêñ balkêş dide; yek ji wan Wezîrê Karûbarê Derve yê Amerîka yê berê Henry Kissinger û û din jî Gorbaçov. Qeneeta wî ew e ku Kissinger siyaseta xwe li ser bingehê waqîiyetê ava kiribû. Lê dîsa jî rojek ji rojan bawer nedikir ku Yekîtiya Sovyet û sistema sosyalist wê têk here. Ji ber vê yekê jî lê digeriya ku mirov dê çawar di dunyayekê ku sosyalizm roj bi roj xurt dibe de bijî û menfeetêñ xwe biparêze.

Ji bo Gorbaçov dibêje ku, Gorbaçov di 1985'an de pesnê Stalin dida û wek Krusçev kolleştîkirina Stalin a salêñ 30'i diparast. Ancax di 1987'an de Lenîn û Buharîn qismî parast. Di guhetina van fikran de jî xuya dibû ku Gorbaçov tu demekê bawer nedikir ku wê sosyalizm tek here.

Fukuyama têzên xwe li ser Hegel û şirovekirê wî filozofê Fransız Rûs Alexandra Kojéve ava dike û pêş dixîne. Bawerîya wî ew e ku pişti têkçûna sistema sosyalist bi siyasi û iqtisadî dîroka mirovayetî yê û dîroka mirovayetî de demokrasî û ekonomîya liberal e û ev yek jî dawîya guherandina ideolojîk a dîroka mirovayetî ye.

Li ser vî bingehî jî dîbêje ji bo Marks pêşketina dîroka mirovayetî yê bi cîvata komunist dawî dihat, ji bo Hegel jî dewleta liberal bû.

Fukuyama dide xuyakirinê ku cewherê dewleta liberal an jî demokrasiya liberal hewcedariya ku xwe bide qebûlkirinê ye. Çunkî ji bo Hegel hêza ku dîroka mirovayetî pêş dixe û di livîne muhtaciya xwe bide qebûlkirinê ye.

Ew li ser vî bingehî idia dike ku hindî dîrok çêbûye heta nuha, di esasî ji şerî di navbera du mirovan de çêbûyi bigre heta şerî di navbera dewletan de çêbûyi hewcedariya xwe bide qebûlkirinê heye. Ji ber vê jî qeneata wî ew e ku di siyaseta hundîrîn û a derveyî de, di siyaseta partîyan ku li hemberî hevdî reqabeta di tîcîtê de û şerî di navbera gelan û dewletan de dibe hemû jî ji hewcedariya xwe bide qebûl kîrînê der tê. Û ew reqabet û xebat ji sîsed salî vir de ye dewlet û ekonomîya liberal dide jiyanîn di domine.

Ji bo Fukuyama sistema herî baş û bê alternatif dewlet û ekonomîya liberal e. Bê şik berî her tişti dixwazîm bidim xuyakirinê tiştên ku Fukuyama ci di çerçeva filozofî ci jî di çerçeva ilmîn civakî de bahs dike tiştên ciddî ne. Pêwîst e ku mirov munaqşen kûr li ser bike. Lê Fukuyama bi xwe jî (bi taybetî welatîn ku bi şeklî dewleta liberali jî tê idarekirinê) nikare bersîva bê edaleti, belengazî û bê çaretiya ku dinya me de heye bide. Bê edaleti û feqîrî iro ne li tenê Efriqayê, li Asyayê an jî li Latin-Amerikayê heye. Belengazî û bê edaleti û iro li dewletîn herî xwedî refah dewletîn ku bi demokrasî û ekonomîya liberal jî wek Amerîka hin welatîn Awrûpayê hetanî navîkê ye...

BEROS



Mahmûd Lewendî

Manga bi ga !

Îro ber destî sibê ez ji xwe re di xeweke giran û kûr de, di nav xewneke xweş a têr giya û nefel de raketibûm. Lê malmîratê xwedîyê min saet şeşê sibê bi zixtan ez ji wê xewa xweş a di nav rêtê de şîyar kirim.

Ax ax, xwezîka ji bo me dewaran jî saete çêkirana, zîla wê qûrmîşkirana û em jî wek însanan bê sitres û tirs pê şîyar bana. Hün nizanîn ewê çiqas xweş baya. Kanê ew sans!

Neyse, golika min hê razayî bû. Berî ku xwedîyê min wê jî bi zixtê şîyar bike, ez giham ser wê û min ew bi zimanê xwe yê xweşik û mezin alast û şîyar kir. Feqîrê bi çavên nîvçe vekirî û tiji kîlîşk pel pel li min û xwedîyê me yê rûtîş dînihîrt. Xwedîyê me ji bo taştê hinek kâ û kapek tevîhev kir û rijand ber me. Xwedî jê nerazîbiyo, tu dibê qey em kolê wî ne! Mîrata ka û kapek jî zuha-zuha naçe xwarê. Me ka û kapek bi şorika devê xwe nermijand û xwar û me berê xwe da derîyê derve. Hevalên me yê din jî hemû derketibûn derve. Hinek li gel golikên xwe, hinekên avis, hinek jî li gel gayê xweyanê bi gotina we însanan mîrê xwe derketibûn. Hinek xuya bû jî êvar de raneketibûn nigêñ wan li hev çoqal bûbû, yêner tî razayî jî ji meş û çûna wan diyar bû.

Me hemûyan li pey hev berê xwe da çêreya gund. Gavanê gund ku serokê me ye li kera xwe siwarbûyî li hêvîya me bû. Bi zimanê xwe bi ser me de qîjiya, her cendî me ji zimanê wî fam nedikir jî lê ji qermiçokên enî û ruyê wî xuyabû bi me de dixeydi. Lê em nizanîn ci ji me dixwaze. Axx axx ma ji bo me dewaran jî tercumanek hebûya wê çiqas baş bûya. Wê wextê me yê ji zimanê serokê xwe fêm bikira û her sibe êdî ew ruyê tirş mumkune li ber me şîrîn ba, lê kanê ew şans, ji bo ku em bikaribin xwedî tercuman bin divê ku em ji ga û mangetîyê derkevin bibin însan. Ew jî ji bo me girin e. Yanê nuha ezê çawa rabim eslê xwe încar bikim, wekî manga an jî gayekî ezê rabim bibêjim ku ez însan im. Ez nikarim bêpîrîyê bikim! Ma gelo ji însan re bibêjin ku divê ku hûn bibin ga, bi ya we xweş e? Bê guman na!

Golika min a feqîr ji ber vê qîjîna serok her şev ji xew vediciniqe û diqîfre, hawara wê ye dibêje "dayê serokê rûtîş hat!". De were vî derdî bikşîne! Ême tişt nabe ji me çû, lê golika min a xama hê nû ye, teze û nazik e, ji nuha de bi tirs û xof mezin bibe, sibe ro bibe nogin ewê xwe qet nêzî cangeyan neke. Ewê her bi tirs û fediyok be. Ez ditîrsim golika min pişti ku hat çaxa nogintîyê ji xwe re cangeyekî nebîne li malê bimîne. Ji xwe qelin jî buha bûye, berê bi du rîsî giha her cangeyekî dikarîbû ji xwe re noginek bidîta, lê kanê ew wext, nuha ne du rîsî, bi ser de çewalek ka û du telîz kapek jî dixwazîn, feqîrê cangeyan nikarin bizewicin. Gerçî emîn ez li dij qelin im, lê te dî mîrata edetê. Ez nuha rabim golika xwe bê qelin bidim cangeyekî, civata me ya dewaran ewê derhal dest bi paşgotinîya bikin. Na efendim golika wêne golik e, ji goliktiyê xistine, nizanim cwangê mala filan gayî dest avetîyê û nizanim ci û çi! Ez serê we neêşînim, vê wextê zehmete ku mirov diya golika be.

Min cwangê xwe par zewicand. Me jê re noginek ji mala Gayê Matore anî. Me çi dawet li dar xist! Çil mange û çil ga bi hev re diûriyan. Me govendek welê girt ku toz û dûmana rasta gund ji ber tepe repa govenda me bi ezmana de bilind bû. Hela tew govenda cwange û noginê xama û teze yên ji êla Gareşan bala hemû dewarîn vexwendî yên dawetê kişand. Nogin û cangeyan ji eşqa hevûdu, govendeke çarsimkî ya kerki girtin, tiştekî dûrî aqila bû. Ci roj bû, ci dawet bû! Lê li ser me geleki kelîfi, dewarîn vexwendî xwarinek xwarin, rîsî û ka û kapek û nefel, welê xwarin ku zikê wan werimî bû dehol û kerixin.

Hema bi xêr û xweşî bê qeza û bela min salek din golika xwe jî bida mîr êdî tu xem tunebû. Gerçî cangê mala Manga Belek cangeyekî mulayim û efendî ye. Ez texmîn dikim dilê golika min jî di wî de heye. Her cendî li çêrê çend caran Manga Belek di ber min re avêt jî, lê hela ka em binîrin.

DUMAHÎK HEJMARA BÊ...

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

♦ Derziya ku îro em di drûnê de bikarînîn cara yekem ji aliye însanê "Cro-Magnon" hatîye bikarînanê û 30000 sal berê hatîye çêkirin.

♦ Li gor lêkolîna Ricard A Meyer li unîversita Tibî ya Johns Hopkins li Ralîmore li DYB, îsota tûj tesireke xwe ya tevizandinê heye. Îsota tûj êşa mirov kêm dike ji ber ku tê de "capsaicin" ku sinirê mirovî ditevizîne heye.

♦ Einstein (Aynstain) diploma xwe ya dibistana bingehîn hîç nesitend. Wî ji disiplinê hîç hez nedikir û ji dibistana Almanî nefret dikir. Ji ber vê yekê jî bavê wî ew şand dibistana polîteknîkî li Zürich û li wê derê diploma xwe stand.

♦ Krema (macun) diran BZI di sala 100 an de ji aliye doktoîe itali Scribonius Largus hatîye dîtin. Wî kirema diran jî sîrke, hungiv, xwê û camêñ hurkirî çêkirî ye.

♦ Lawikê Rûsî, Vassiyê 21 mehî dikare bê rawestan di 15 saetan de 33 km avjenî bike. Vassiyâ Razenkov xwarina xwe ji di dema avjeniyê de dixwe. Vassiyâ li gor prensibîn Igor Çarkovski ketîye perwerdekirin. Li gor metoda Çarkovski zarok di nav avê de tê dinê.

♦ Darêni li daristanê pelên xwe û guiliyên xwe di bilindiya xwe de dicivînin. Lê dara ku li baxçan û li zeviyan in guiliyên xwe hem li her deren xwe hene û hem jî pelên xwe bela wela ne.